Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1151 | 13-Adar- 2024 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
nameronahi@gmail.com
☎ 423165

# Hunermenda karê destan Cîhan Ebdulxefûr

Berçem Silêman/Qamişlo

Hunermenda karê destan cîhan Ebdulxefûr diyar kir ku hezkirin û kelecana wê ji bo karê destan ji zarokatiyê dest pê kiriye û heta niha berdewame, herwiha ew bi riya vî karî hestên di hundirê xwe de derdixe holê.

Cîhan Ebdulxefûr di sala 1987'an li bajarê Hesekê ji dayîk bûye, di refa 4 'an de fêrî karê destan bûye, di wê demê de çalakiyên piştî dibistanê hebûn, xwendekar fêrî çêkirina gul û bikaranîna cebsînê dikirin. Guhdana mamoste bi Cîhan Ebdulxefûr re hişt xwestek û hezkirina wê zêde bibe ji vî karî re. wê dev ji vê yekê berneda û piştî qedandina qonaxa navîn, hunera bedew xwend û di refa 12'an li ser depan min kar dikir, paşê min dît ku girêdana filiklor jî bi vî karî re heye, lewma min ew jî li karê xwe zêde kir. Niha werşeya min jî heye nêzî 25 jinî ne, karê destan dikin, di nav wan de jinin hene ku gelekî kêfa wan ji vî karî re tê, lê nikarin werin werşê, ez jî derfetê didim wan ku karê xwe li malê bikin."

### Kar û xebatên hunermend Cîhan Ebdulxefûr

Hunermenda karê destan Cîhan Ebdulxefûr axaftinên xwe bidawî kir û wiha got: "Ez tevlî 2 fastîvalan bûme yek ya wêneyan ya Rojava, min tê de sê tablo pêşkêş kirin, herwiha ev 9'emîn festîvala jinan ya ku ez tevlî dibim, destpêkê ez tevlî pêşbirkên ku di festîvalê de



de ya yekem derket. Paşî li Şamê amadekirina mamoste beşê karê destan xwend.


Di derbarê jiyan û hezkirina karê destan de, hunermenda karê destan Cîhan Ebdulxefûr ji Rojnameya me re axivî.

### Jiyana Cîhan Ebdulxefûr

Cîhan Ebdulxefûr diyar kir ku piştî xilaskirina wê ji zanîngehê re, çar salan mamostetî kiriye û wiha got: "Piştî mamostetiyê min li navenda Xabûr a bajarê Hesekê perwerdeya hunerê da zarokan, nêzî 30 zarokî bûn me di du mehan de ji wan re pêşengeheke hunerî vekir. Piştî vê yekê wezareta çandê biryara vekirina cihekî ji bo karê destan dan, 6 salan min di wê dikanê de bi werşê re karê destan kir. Piştî vê yekê min karê xwe cûda kir, niha li bajarê Qamişlo bi mamoste Ferîd Hiso re filiklor û li ser depan kar dikin, dikana me li taxa Xelîc li bajarê Qamişlo ye, destpêkê tenê dihatin çêkirin dibûm, sala yekem û ya sêyem min xelata yekemîn weregirt, sala duyem min xelata kesê duyem wergirt, êdî ez nema tevlî pêşbirkan bûm, min xwest ez derfetê bidim kesên din da ku xelatan wergirin. Wan salên din jî di fastîvalê de min dîkor çêdikirin û pêşkêş dikirin, 4 salan min xelat wergirt. Îsa jî ez tevlî festîvalê bûm him min karê destan pêşkêş kir, him jî pêşandana cil û bergên kurdî. Ez gelek bi heyecan bûm ji bo vê fastîvalê û nêrîna kesên hazir li ser karê min ez bêtir kêfxweş kirim, her sal ev fastîval bidawî dibe, ez dihizirim sala bê ez ê çi pêşkêş bikim. Di heman demê de ev fastîval destekê dide gelek jinan wek; jinên ku derfeta wan nîne cihekî taybet vekin yan jî dayîkin, di festîvalê de karê xwe pêşkêş dikin. Daxwaza min ji bo hemû jinên ku ji vî karî hezdikin û vî karî dikin tevlî fastîvalê bibin û karên xwe pêşkêş bikin."

# Bila wêneyên min ji bo hemû kesan bibin hêvî

**Li Tahranê şêwekar Arzû Safaî pêşangeha xwe ya şexsî vekir û diyar kir ku dixwaze wêneyên wê ji bo hemû kesan bibin hêvî û got: "Ji bo ez xwe ji aliyê tarî yê jiyanê û aciziyan dûr bixim min xwe spart van hestên xweş."**



Pêşangeha şexsî ya şêwekar Arzû Safai di navbera rojên 16-20 sibatê de li Galariya Goya ya Tahranê bi kesên ku eleqeya wan ji wêneyan re heye hat ba hev. Xwendakara beşa dawî ya wêneyê Arzû Safai got: "Eleqeya min ji wêneyan re ji zarokatiyê be dest pê dike. Dema ez mezin bûm min biryar da ku di vê qadê de perwerde bigrim."

Arzû Safai da zanîn ku li zanînageha Soore ya Tahranê perwerdeya lîsansê girtiye û got: "Wêneyên min ên wê demê ji yên niha gelek cuda bû. Wê demê hê zêdetir mijarên civakî û aliyên jiyanê yên tarî min dikir wêne, weke rexneya civakê bû, min hez dikir ez vî aliyê tarî, tenê tî û sanayî bidim nîşandan."

### 'Min xwest bi tabloyên xwe kêfxweşiyê bidim'

Arzî Safai destnîşan kir ku piştî zewiciye demekê navber daye xebata xwe û wiha got: "Piştî keça min Hana ji dayik bû jiyana min bi reng bû. Hana bi xwaze nexwaze di nava van şertên civakê de mezin dibû, di qadek ku nûçeyên xirab bibihîse de bû û min xwest ez vê ji bo wê biguherînim. Ji ber vê jî min bi xêzkirina gul û bilbilan vê enerjiya negatîf ji bo wê biguherînim. Eleqeya min a gulan ji zarokatiyê tê, heta di xwezayê de di demê vala de ew wêneyên ku me dikişand. Min bi tabloya xwe 'bilibila bi pelên gul' kêfxweşiyê bidim mirovan. Ji bo ez ji vê tarîtiyê û neyêniyên civakê dûr bikevim min xwe spart van hestên xweş, heta ên ku serdan dikirin dema berhemên min didîtin hemat tişt ji min re di gotin."

### 'Divê jin ew tiştên ku hîs dikin wê pê bi pêş bikevin bila bikin'

Arzû Safai bi bîr xist ku ji ber şertên zehmet piranî mirov xeyalên wan dişikên û got: "Ez bi giştî ji ber mirovek bi hêvî me, min xwest ez vê kêfxweşiyê belav bikim. Bila wêneyên min ji bo hemû kesê bibe hêvî. Rast e gelek berpirsyariyên jinan hene lê belê ez ê rê li ber mirovan vekim divê tişta ku hîs dikin dê bi pêş bikevin bikin, ez jî vê dikim û ez fêrî keça xwe jî dikim."**NÛJINHA**

**Sudoku: Bersiv 63**

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 9 | 4 | 7 | 2 | 6 | 8 | 1 | 5 | 3 |
| 8 | 1 | 5 | 4 | 3 | 7 | 6 | 2 | 9 |
| 2 | 6 | 3 | 9 | 5 | 1 | 4 | 8 | 7 |
| 1 | 3 | 2 | 7 | 8 | 4 | 5 | 9 | 6 |
| 6 | 5 | 4 | 3 | 9 | 2 | 8 | 7 | 1 |
| 7 | 8 | 9 | 6 | 1 | 5 | 2 | 3 | 4 |
| 3 | 9 | 1 | 5 | 2 | 6 | 7 | 4 | 8 |
| 5 | 7 | 8 | 1 | 4 | 3 | 9 | 6 | 2 |
| 4 | 2 | 6 | 8 | 7 | 9 | 3 | 1 | 5 |

**Sudoku:Pirs 64**

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 9 | 5 | | 2 | 1 | | | 8 | |
| | 2 | | 8 | | | | 6 | |
| | | | 3 | 7 | | | | 9 |
| 8 | | | 7 | | | | | 1 |
| | | 5 | | | | 9 | | |
| 3 | | | | | 4 | | | 6 |
| 1 | | | | 8 | 7 | | | |
| | 6 | | | | 2 | | 9 | |
| | 9 | | | 5 | 1 | | 3 | 7 |

## FERHENGA BIWÊJAN

**Çûye talanê hestiyan dide hev:**
- Ji bo karê mezinan çûye karê piçûkan dike.

**Çû mala Pûnê, vegeriya dest li ser qûnê:**
- Destvala vegeriya.

**Dara bêber e:**
- Qencî jê çênabe.

**Dawet nîne ew li kevçikan digere:**
- Tiştên bêwate dike.

**Destek li pişt, yek li pêş:**
- Çû bazirganiyê lê vala vegeriya.

**Di bêjingê de dohtin, di seradê de meyandin:**
- Karê bêwate kirin; keda wan tev ket avê; di karê xwe de tiştek bi dest nexistin.

**Diçîne nîskê:**
- Gotinên wî vala ne; nikare biryarê bide.

**Dixwaze xezalê bi davikên çûkan bigire:**
- Tiştên ti kesî nekirî dike; tiştên bêwate dike.

**Eger bi dengê bilind bûya, wê qesra kerê ji ya her kesî bilindtir bûya:**
- Tişt bi qîreqîrê nabin.

**Em bûn şivanê jîjoyan:**
- Em pir man li bendê û tiştek jî bi destê me neket.

Emrê me derbas bû bi Ebasî.
- Me tiştek ji xwe fêm nekir.

**Ez xwe bi tehtan digirim, ew jî hatiye xwe bi min digire:**
- Ez xwe dispêrim hina, ew jî hatiye xwe dispêre min.

**Giliyê Şûto li Rûto dike:**
- Giliyekî bêsûd e.

Gotin birayê te bû axa, got ji min re çi, jina wî bû xatûn.
- Dema mizgîniya bûyerekê didin kesekî ku sûdê ji wê bûyerê nagire, hingê tê gotin.

**Ha li deşta Mûşê, ha li darê dergûşê:**
- Bêsûd e.

**Hesp nîne li hevsar digere:**
- Bi karê bêwate ve mijûl e; karê bêencam dike.

**Hesinê sar dikute:**
- Karê beredayî dike; karê bêwate dike; karê ku dike bi kêrî tiştekî nayê.

**Hesin bi sarî ba dide:**
- Bi heman wateyê.

**Hesp nîne afir çêdike:**
- Tiştên bêwate dike; tiştên beredayî dike; tiştên bêwate dibêje.

**Hesp nîne zîn dikire:**
- Bi heman wateyê.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## 'Jin bi abûriya xwe di nava civakê de hêz û baweriyê digre'



Berdevka aboriya Kongira Star a herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê Gulîstan Mûrad diyar kir ku çiqasî îradeya jinan xurt be, wê ewqasî karê wê serkeftî be, herwiha çiqasî fikrê jinan azad be, wê zêdetir gavên mezintir bavêjin.**R-2**

## Yek ji mûmên azadiyê; Helebce Xelîl



Şehîd Helebce Xelîl tevî ku ducanî bû jî, lê tiştek li pêşiya wê nebû asteng û ji bo xizmeta civakê û bedewkirina bajarê xwe bajar bi bajar digeriya. Dayika wê Mekiya Hiso diyar kir ku Helebçe her dem ji bo pêşxistina civak û derdorê kar û xebat dida meşandin.R-6


Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1151 | 13-Adar- 2024 | www.ronahi.net/ku/

# SERHILDANA QAMIŞLO HÎMÊ ŞOREŞÊ AVA KIR

Di 12'ê Adara 2004'an de li stadyuma bajarê Qamişlo dema leystika gokê di navbera tîma El-Cîhad û El-Fitiwa de qewimîn li ser gelê Kurd li Rojava ji milê rejîma Baas ve kumkujî hate pêkanîn. Piştî ku kumkojî li ser gel pêkhat hemû bajarên Rojava bûne qadên serhildanên girseyî û gel li hemberî rejîma Baas serî rakir. Serhildana Qamişloyê ya bi pêşengiya Kurdan ji tevahî gelê Sûriyeyê re bû meşaleya têkoşînê ya li hemberî polîtîkayên kuştin û çewisandinê yên rejîma Baasê. Gel jî li hemberî hemû hewldanên derxistina fitneyê û parçebûnê di nava gelan de soz da destkeftiyên Şoreşa Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê biparêzin.**R-5**




## Riya IMEC'yê ya abûriyê ya hêzên kaptalîzimê, rêya qirkirna gelan e




Hêzên Kaptalîzim ji bo pêkanîna serweriya xwe li Rojhilata Navîn, di nava piroje û planên serweriya aborî de bênavber berdewam in. Yek ji girîngtirîn projeyên aborî yên hêzên kaptalîzim, riya IMEC ya aborî ye. Lê ji ber ku ev riya aborî ku ji Hindê ber bi Ewropayê ve diçe, ne li gor berjewndiyên Tirkiyê û Îranê bû, wan ji bo tevlihevkirina kaxezan Hemas bikar anîn.**R-4**

## Rê û resmên Meha Remezanê



Welatî û firoşkarên bajarê Qamişlo diyar kirin u ji ber buhayê bilind yê kelûpelan her kes di meha Remezanê de zehmetiyan dikşîne û gotin, ji ber têkçûna nirxê lîreya Sûrî û êrişên dewleta Tirk a dagirker piraniya malbatan di milê aborî de zehmetiyên mezin dibînin.**R-3**

## Helbestvanê bi helbestê re mezin bû; Ferhadê Merdê



Helbestvan Ferhadê Merdê ji zaroktiya xwe ve ji helbestan hez dike û li gelek helbestvanan guhdar dike û bi wan bandor dibe û bi wî rengî dest bi nivîsandin û xwendina helbestê dike. 300 helbestên wî hene piraniya wan şoreşgerî û li ser şehîdan e, yekem alboma wî jî bi navê Gulfiroş bû. Ferhad destnîşan kir ku wî helbesta bi navê Tu dûrî jî amede kiriye û wê berî Newrozê bê belavkirin.**R-7**

Têgehên cinsiyetparêz çarenûsa jinê diyar dikin — Nehîr pale — R-2

20 sal in hişmendiya dewletê ya 12'ê Adarê hîn berdewam e — Dilyar Cizîrî — R-4
Plana Aloziyê Dixebite — Zekî Bedran — R-5

Rihê Serhildana Qamişlo — Farûk Sakik — R-5

Rexnegiriya Wêjeyî û Rexnegiriya Rexneyê — Kemal Necim — R-7

# Her kes dikare bi ked û behreyên xwe cihê xwe di nava civakê de bigre

**Rêxistina Nûdem, bi armanca tevlîbûna astengdaran ji civakê re di sala 2021`an de hat avakirin. Nûdem kar û xebatên xwe li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê dide meşandin. Herwiha Berdevka Rêxistina Nûdem Davyan Mehmûd diyar kir ku pêşketina kesên astengdar ji pêşketina civakê ye.**

**Ronahî Sadûn/Qamişlo**

Rêxistina Nûdem a Amadekirin û Geşedanên Mirovî ya Astengdaran bi hizra jineke kurd ve di sala 2020`an de ji aliyê komek jin ve hat damezrandin, armanca wê ew e ku kesên astengdar tevlî civakê bikin. Ji ber ew jî beşek ji civakê ne û pêwîste ku jiyana xwe mîna her mirovekî di civakê de jiyan bikin. Herwiha bi rengekî fermî rêxistina Nûdem di sala 2021`an de hat avakirin. Nûdem li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê kar û xebatan ji bo astengdaran dide meşandin. Di heman demê de navendên wê li Qamişlo, kampa Waşo Kanî heye, wekî din jî dilxwazên wê li Şehba, Heleb, Dêrik, Hesekê, Tiltemir hene û xebatan li van cihan didin meşandin. Kesên astengdar di civakê de mafê wan heye. Dibe ku taybetmendiyên astengdaran cudayî kesên normal bin, lê hizirên wan yê pêşketinê heye, dikare pirojan bidin avakirin û li pêş bixin, herwiha bi ramanên xwe derdorê xwe fêr bikin.

**kêmbûna alîkariyê derfetên avakirina pirojeyan kêm dike**

Rêxistina Nûdem tevî ku xebatên xwe li ser amadekirin û geşedanên astengdaran dide meşandin, lê bi gelek beşan ve radibe, mîna beşê perwerdê, hêşyarkirina civakê, lewra ji dema avabûna wê, di komînan de perwerdeyên wê li ser hişyarkirinê berdewamin. Nûdem zarokên astengdar pêşwazî dike. Lê ji ber kêmbûna alîkariyê, derfetên wê



yên avakirina pirojeyan ji astengdaran re kêm e. Kesên dilxwaz û xêrxwaz hin caran alîkariya wê dikin, li gorî wan alîkariya zarokên astengdar fêrî perwerdeyan dikin. Herwiha zarokên ku tên perwerdekirin, Nûdem li malê jî çavdêriya wan dike û rewşa wan dişopîn e. Di heman demê de di heftiyê de 3`ê rojan Rêxistina Nûdem serdana malbatên kesên astengdar dike.

**Nûdem hewl dide derfetên kar ji astengdar re bide avakirin**

Ji ber kêmbûna derfetên fêrkirin û karkirinê ji astengdaran re, rêjeyek mezin ji astengdaran naçin dibistanê. Rêxistina Nûdem ekîbên ji çend kesên astengdar avakirin û perwerdeyan li gorî xwesteka wan didin. Perwerdeyên ku têne dayîn jî evin; Pisporiya Kompıterê, Wêneyê Fotogirafî, Jêhatîbûna Hesankirinê, Lojistîk, Çavdêrî, Nirxandin û hwd… armanca wan ew e ku karibin astengdaran fêr bikin. Lewra piştî perwerdekirina wan, ji aliyê Nûdem ve danûstandin bi hin cihan re dibe, da ku derfetên kar ji astengdaran re bên avakirin. Herwiha ji bo hişyarkirina giştî civakê Nûdem çalakiyan li dar dixe. Rojên cîhanî yên astengdarên Dawin û Tewehid, bi çalakiyan ji astengdaran re bi bîr tîne û mafê astengdaran ji civakê re didin naskirin.

Derbarê kar û xebatên Rêxistina Nûdem a Amadekirin û Geşedanên Mirovî ya Astengdaran de Berdevka Rêxistina Nûdem a Bakur û Rojhilatê Sûriyê Davyan Mehmûd ji rojname me re axivî. Davyan Mehmûd diyar kir ku dema astengdarî di bedena mirov de hebe, nayê wateya ku astengdarê her tiştiye û wiha got: “Em girîngiyê didin kesên astengdar û hewl didin wan tevlî civakê bikin û pêşerojekê ji wan re bidin avakirin. Astengdarên ku jêhatiyên wan hebûn mîna karê desta, Dengbêjî, Wênesazî û Dirotina cilan dikirin, me ji bo wan pêşengehek li dar xist, di wê pêşengehê de ji hemû bajaran kesên astengdar tevlî bûn, jêhatiyên xwe pêşkêş kirin, armanca me ewbû ku wan li pêş bixin û kêfxweşiyê bixin dilin wan. Ji ber astengdariya di beden de nayê wateya ku astengdarê her tiştî ne, lê astengiyên li hemberî astengdaran civak bi xwe ye.”

**‘Pêwîste baldariya civakê ji astengdaran re hebe’**

Davyan Mehmûd di berdewamiya axaftina xwe de bangewazî kir ku ji astengdaran re derfetên kar bên vekirin û wiha got: “Pêwîste ku baldariya civakê ji astengdaran re hebe, di heman demê de dema ku avahî bên avakirin, baldariya wan ji bo kesên astengdar hebin, da ku astengiyê di wir de nebînin. Ji bo astengdarên ku dikarin tevgerê bikin derfetên kar bên vekirin, herwiha ji bo astengdarên dawin jî dibistanên taybet pêwîstin. Hêviya me di her dibistanekê de beşeke taybet ji astengdaran re bê avakirin, dibistan bi vî rengî çalak bibin, hizirên astengdarên dawin pir hene, lê derfet ji wan re nehatiye avakirin, em wek Nûdem hewldanên me ji bo vê yekê hene.”

**‘ Pêşketina civakê bi xwere kesên astengdar jê pêştêxe’**

Berdevka Rêxistina Nûdem a Bakur û Rojhilatê Sûriyê Davyan Mehmûd axaftina xwe wiha qedand: “Kes giraniyê nade kesên astengdar, hin caran çalakî ji zarokan re tên lidarxistin hemû zarok kom dibin, lê gazî zarokên astengdar nakin. Ev yek jî bala min kişand, ji ber ew jî zarokin, ji ber wê yekê pêwîste di çalakiyên zarokan de gazî zarokên astengdar jî bikin. Herwiha hewldanên me hene ku xebatên xwe hîn berfireh bikin. Di heman demê de saziyên girêdayî Nûdem û yên têne avakirin, wek navenda tedawiyên fîzîkî werin bikaranîn. Xwesteka me ev e, lê kes destekê nade Nûdem ku piroje û daxwazên ji bo astengdaran pêk bînin. Herwiha malbatên kesên astengdar nebin astengî ji zarokên xwe re, ji ber pêşketina civakê bi xwe re kesên astengdar jî pêştêxe.

# ‘Jin bi abûriya xwe di nava civakê de hêz û baweriyê digre’

**Ayşa Silêman/Qamişlo**

**Berdevka aboriya Kongira Star a herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê Gulîstan Mûrad diyar kir ku çiqasî îradeya jinan xurt be, wê ewqasî karê wê serkeftî be, herwiha çiqasî fikrê jinan azad be, wê zêdetir gavên mezintir bavêjin.**

Wateya peyva aborî di zimanê yûnanî de ekonomiye, ekonomê tê wateya zagonên birêvebirina malê, ya ku malê bi rêve dibê û pêwîstiyên wê pêk tîne jin e. Gava mirov li dîrokê jî vegere, di civaka xwezayî de jin ê mal birêve dibir û çandinî ji cem wê dest pê kir, piştî çandiniyê gava berhem çêdibûn, tişta ku jê zêde diman radikir, da ku pêwîstiyên malbatê pêk bîne. Hişmendiyê zilam herdem desthilat dariye, herdem bi nêçîrê dihizire û hêza xwe derxe. Berûvajî vê yekê jin bi malbat û derdora xwe re difikirî, ji her tiştî hewil dida pêdiviyên xwe pêk bîne wek; ji çermê lawiran cil û berg ji bo xwe û malbata xwe çêdikirin, herwiha berhemên ku bi riya sewalan derdikevin xist di bin xizmeta civakê de.

Di derbarê kar û xebatên Aboriya a xweser Jin Berdevka aboriya Kongira Star a herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê Gulîstan Mûrad ji Rojnameya me re axivî.

**Kar û xebatên Aboriya Xweser a Jin**

Gulîstan Mûrad diyar kir ku destpêka avêtina vê gavê gelek zehmetî derbas bûn û wiha got: “Gava me ji jinan re digot werin em pirojeyan ji were avabikin, yan jî bibin xwedî aborî, neqebûlkirin li cem wan hebû. Ji ber ku ev jin di dema hikûme Şamê de ji mafê aboriyê bê par û bê biryar bû, di bin siya zilam de kar dikir. Herwiha hişmendiya baviksalarî ya ku bi hezarê salan jin di nav malê de hişt, tenê ew wek amûra anîn û xwedîkirina zarokan didît, ev yek bandoreke neyînî lê kiribû. Di heman demê de kapîtalîzmê bandor li kesayeta jinê kiribû. Rêber Apo jî tîne zima û dibêje; “Aboriya ku bi destê jinê ava bibe, abûriyeke saxlem e, ji ber ku jin xwedî zihniyeteke paqij e, hertim bi malbat û derdora xwe difikire û pêwîstiyên wan bi çi awayî pêk bînin û bi pêşketina welatê xwe jî difikire.”. Aborî bingehê avakirina hemû welataye, bi taybet demên niha de sedema êrîşên dewleta Tirk li ser herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji bo abûriyê ye, herwiha binesaziyên herêmê armanc girtin. Çawa ku Şoreşa 19’ê Tîrmehê bi Şoreşa jinê tê naskirin, ji ber vê yekê pêwîst bû jin ji aboriyê bê par nemîne. Ji sala 2015’an de heya roja îro em di nav hewildan û lêkolînan de ne, da ku roj bi roj em aboriya jinê xurttir bikin û hijmara pirojeyan zêde bikin.”

**Rizgarkirina jinê ji tirsa bavkisalariyê**

Gulîstan Mûrad wiha pê de çû û got: “Erkê me ye ku em ji bo jinan



derfetên kar peyda bikin, pirojeyan ava bikin û komperatîfan zêde bikin, Da ku her jinek rola xwe di cihekî de bilîze. Ya herî baş di vê aboriyê de ku jin bi xwe xwedî biryare û tu kes nikare desthilatdarî û nêrîna xwe li ser ferz bike. Desetpêkê ev gav gelekî zehmet bû, ji ber ku jin bi tirs bû, hîn tirsa hişmendiya baviksalariyê di dilê wê de bû. Ji ber vê yekê, komîta perwerdê ya Kongra Star û rêxstina Sara destpêkê me hewil da bi riya perwerde, nîqaş û serlêdanan hişmendiyê jinê pêş bixin, ev yek jî encamek baş da. em dibînin ku jin di dema niha de ew bi xwe nêrîn û pirojeyên xwe pêşkêş dikin. Ya girîng li cem me kompiratîvin, ji ber ku em wekî aboriya civakî tên naskirin, aboriya civakî jî bingeha xwe ji kompiratîvan digre, kompiratîv sîstemeke li hemû welatên cîhanê heye, lê li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê ne bû, ji ber ku herdem dewletan desthilatdariya xwe feriz dikir, herwiha komperatîv sîstema sermeyandariyê qebûl nake, ji ber komperatîv karekî hev beş e, herkes wek hev ked dide û encam digre, sîstema fon û desthiladarî radibe.”

**‘Roja 8’ê Adarê li cem jinan hêviyek nûye’**

Berdevka aboriya Kongra Star a herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê Gulîstan Mûrad axaftina xwe wiha qedand: “Destpêkê hişmendiya jin û civakê ji bo sîstema komperatîvê nehazir bû, lê gava ket di nav piratîk de û encam girtin, êdî jin bi xwe karê xwe dikin, pirojeyên xwe pêşdixin. Herwiha bingehê kompiratîvê bi hev re karkirin, aboriya komînal li dijî sîstemên desthilatdar rabû û kesê ku di kompiratîvan de kar dikin pêkhateyê vî welatî ne, gava aboriya herêmê dibin destê gelê herêmê de be wê bêtir xwedî lê derkevin, herwiha çiqasî kar pêş bixin û berhem zêde bin, aboriya wan wê xurttir bibe, li ser vî esasî kar û xebatên komperatîvan hatin birêvebirin, aboriya jin jî bêtir girîngiyê didin çandiniyê, ji ber ku pirojeyên me yên din bingeha xwe ji çandiniyê digirin. Heta niha li hêrêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê nêzî 45 komperatîvên çandiniyê hene. Roja 8’ê Adarê li cem jinan hêviyek nûye, ne tenê 8’ê Adarê roja tekoşîn û azadiya jinê ye, divê hemû rojên me bitêkoşîn û berxwedan bin, ji ber ku jin herdem afrîner û xuliqkar e. Çiqasî jin îradeya wê xurt be, ewqasî wê di karê xwe de serkeftî be, çiqasî hêz û kesayeta wê xur be û fikrê wê azad be, wê bêtir bikaribe gavên mezintir bavêje.”

**Ji Pênûsa Jin**

## Têgehên cinsiyetparêz çarenûsa jinê diyar dikin

**Nehîr Pale**

Sîstema dewletê bi riya zimanê civakê fêrî têgehên cinsiyetparêzî kiriye, ji aliyê zihnî ve gelek bandora wê li ser civakê heye. Têgehên mîna; jina berdayî, jinebî, jina di malê de mayî, fahîşe, qehbik û hwd. têne bikar anîn û ev têgeh di nava civakê de eyb nayên dîtin, her kes asayî lê dinêre. Civak ne tenê wan têgehan dide bikar anîn, li gorî wan nêzî jinê dibe û çarenûsa wê diyar dike. Ne bese her tiştê jinê eyb tê dîtin; wê her tim bi hinek têgehan didin nas kirin. Ji xwe ev têgeh ji bo mêr nayên bikar anîn. Jinên tên berdan dîse bi destê mêr dikevin vê rewşê, yên hevjînên wan mirîne ne sûcê wane, ya nezewicî ye misoger sedemên wê hene.
Çima hemû pirsgirêkan bi jinê rave dikin? Tu kêmasî di mêr de nayê dîtin û çi pirsgirêk derbikeve jinê sûcdar dikin. Eger mêr jinê berde, eger mêr bimre, eger bi hev bikevin hemû tiştî dixin sukra jinê de.
Gelo buyerên tûndî, tecawiz û kuştinê çiqasî çavkaniya xwe ji van têgehan digrin? Mirov ji bo ku şad bibe gelek teşeyên çûkan dixin qefesan û wan fêr dikin ku eger ji wê qefesê derbikevin wê bimrin. Jina berday, jina hevjînê wê miriye yan di malê de maye êdî li ser zîhniyeta ew fêrkirine dimeşin. Zagonên civakê ji wan re diyarkiriye pêk tînin, ji ber ew difikirin ku tu şensê wan yê dîtir tine ye.
Ev jin ne jiyan dikin, her roj hêdî-hêdî di fikir û ruh de têne kuştin. Rêbazên gelekî hişk bi van jinan re didin bikar anîn. Beşek ji van jinên berdayî hîna temenê wan gelekî biçûke, şûna ku malbata wan berpirsyartiya wan rabike û destûr bide çavên wan li dûnyayê vebe, hîna temenê wan 12 salî ye wan dizewicînin û temenê wan naghîje 14 salî tên berdan û wan tavêjin ser dayîk û bavê wan. Dayîk û bav êdî keça xwe bar li ser xwe dibînin, qedexe ye ku ji malê derbikeve, nabe ku kesek wê bibîne û jêre li mêrekî digerin. Carekê, du caran, sê caran, çar caran û heyanî 5 caran keça xwe dizewicînin. Ji van jinan gelek kesan dawî li jiyana xwe anîn, ji ber nema dikarîbûn tehemul bikin. Dema mirov buyerên wisa dibîne tu nikare wate bide civakê ku çima wisa li jinê dike. Tu ji xwe dipirse gelo dil û wijdanê bavê wan tine ye ku wan dixe vê rewşê de. Êdî ew jina ku malbata wê wisa li serê wê dike, di ruh de hatiye kuştin, bêçare ma ye, tu hêviyên wê namînin ku birûmet bijî û çarenûsa xwe radestî civakê dike. Piştre jî dema ku ev jin dawî li jiyana xwe bîne, guneh dibînin û eger ji malê bireve yê wê bukjin. Tu şensî nadin wê ku riya xwe hilbijêre.
Jina temenê wê 18 sal derbas kiriye û nezewicî ye, qey sûc kiriye? Dibe ku gelek sedem hebin nezewicî be, lê wê rehet nahêlin, gunehê xwe pê tînin, her didin riwê wê û şerê taybet li ser didin meşandin. Jinên temenê wan 18 sal derbas kiriye dixin rewşa ji xwe fedî bike.
Ji ber van têgeh û ferasetên civakê jin her tim rûbirûyî buyerên gelekî giran tê û nizane xwe biparêz e yan berpirsyartiya xwe rabike.



# Helbestvanê bi helbestê re mezin bû; Ferhadê Merdê

**Helbestvan Ferhadê Merdê ji zaroktiya xwe ve ji helbestan hez dike û li gelek helbestvanan guhdar dike û bi wan bandor dibe û bi wî rengî dest bi nivîsandin û xwendina helbestê dike. 300 helbestên wî hene piraniya wan şoreşgerî û li ser şehîdan e, yekem alboma wî jî bi navê Gulfiroş bû. Ferhad destnîşan kir ku wî helbesta bi navê Tu dûrî jî amede kiriye û wê berî Newrozê bê belavkirin.**

**Emîna Mihemed/Qamişlo**

Ferhadê Merdê di sala 1975`an de li bajarê Qamişlo ji dayîk bûye, ew yek ji helbestvanên kurd yên ku di warê helbesta kurdî de gelek malikên zêrîn hûnandine. Herwiha Merdê bi helbestên xwe hezkirineke mezin di nav dilê civaka kurd de avakırı ye. Helbestvan Ferhadê Merdê di derbarê jiyan, kar û xebata xwe ya hunerî de ji rojnameya me re axivî.
Ferhad Merdê diyar kir ku ew ji zaroktiya xwe ve ji helbestan hez dike û di heman demê de bandora helbestvanên kurd yên derdorî wî li ser wî hebû û wiha got: “Ez di sala 1975`an de li bajarê Qamişlo ji dayik bûme, ji zaroktiya xwe de ez ji hunerê û helbestan hez dikim, herwiha me bi hevalên xwe yên ku li dibistanê diman helbest û stran digotin û di heman demê de bandora hunermend Merwan sebirî û Ebdilqadir Silêma dema ku stran li dawetan digotin li ser min hebû û min jî dixwast ku rojek ji rojan bibim stranbêj û ez jî strana li dawetan bêjim. Min xwendina xwe ya navîn qedand, ji ber ku min ji xwendinê hez nedikir min xwendina xwe temam nekir. Min ji xwe re digot bila dema min tev ji bona stran û helbestan be. Lê dûrbûna min ji Qamişlo nehişt ku bibim helbestvan. Lê di nava hevalên xwe de min dest bi kar û xebata şano kir. Herwiha derfeta min tunebû ku şano bixwînim, lê wiha di nava hevalên xwe de ez mîna lîstikvanekî dileyistim û şanoya min ya yekemîn jî di nava gelên penaber yên mexmûrê de bû û ez li wir derketim ser dikê û pêşberî gel. Ez li kampa Mexmûrê bi navê Dîno dihatim naskirin û bandora kampa Mexmûrê û gelê wê pir li ser min û li ser helbestên min hebû. Herwiha zarokên taxa me jî nedihiştin ku ez van helbestan winda bikim. Ji ber ku dihatin cem min da ku ez ji wan re strana bêjim û dema ku min stran digotin, coş, kelcana min bilind dibû û gelek kêfa min ji dengê min re dihat. Di heman demê de heger mirov helbestan nexwîne û xwe di warê helbestê de pêşnexe nikare helbestê jî binivîsîne. “

**‘Divê helbestvan hişê civakê hişyar bike’**

Merdê anî ser ziman ku strana ku ew gelekî jê hez dike Tembûra dilê min têlê wê qut bûn bû û wiha got: “ Helbestên min derdora 300` helbestan ne û dema ku min şano dinivîsand di navre helbest jî bi min re derdiketin. Di sala 1995`an de Yekem helbesta ku min nivîsand li ser du hevalên me yên Şehîd bû. Herwiha ev helbest di şahiyê de sê caran hat gotin, piştre helbesta bi revandin û dîlgirtina Rêber Apo re, min çêkir. Di wê demê de min bi qasî demekê dev ji şanoyê berda û dest bi nivîsandina helbestan kir û her ku min helbestek dinivîsand hevalên min û malbata min piştgiriya min dikirin da ku berdewam bikim û wiha coş û kelecana min jî bilind dibû û roj bi roj asta min a nivîsandin û xwendina helbestê pêşket. Di serî de pêwîste ku helbestvan mejiyê civakê berfireh bike, şiyar bike û zindî bike, da ku civak bizane dagirkerî çiye, ol çiye, welat çiye, ax çiye, mûzîk çiye. Herwiha rastiyên heyî ji bona civakê bide naskirin. Weke din jî di heman demê de min Rêveberiya çand û hunerê ya sipora serdem jî kiriye. “



**‘Bi şoreşa Rojava re helbestên min bêtir wata xwe gritin’**

Ferhad da zanîn ku pirtûka wî ya yekem ku bi navê Kesera azadî hazire û wê di dema pêş de were belav kirin û ew pirtûk derdora 47` helbestan di nava xwe de digre û wiha got: “Ji bilî pirtûka kesera azadî jî sê pirtûkên din hene ezê wan jî belav bikim. Herwiha elboma min ya destpêkê çêkirî ya Gulfiroş bû û min 11 helbest jî pêre belav kirin ew jî di sala 2004`an de bû. Di heman demê de ez tevlî mîhrîcana li Amedê bi navê şanoya dîno û helbestan bûm û li Hewlêrê jî min tenê şanoya bi navê Dîno pêşkêş kir. Herwiha helbestên min di nava şoreşa Rojava de bêhtir derketin pêş, ji ber ku êş û azarên civaka Rojava him li alîkî ve Şehîd, birîndar û êrîşên dijmin yên bê navber û helbestên girêdayî rewşa heyî û şehîdan dinvîsandin û digotin. Helbestên min jî bêhtirî xwe şoreşgerî, civakî û evînî ne. Weke din jî helbestên min girêdayî bûyerên ku diqewimin de ne û ez bi bûyeran re helbestan çêdikim. Di heman demê de helbesta min a bi navê Tu dûrî jî hazire û wê berî Newrozê were belav kirin û naveroka helbestê jî evînî ye. Weke din jî sê helbestên din jî li ber destê min hene ezê wan jî tomar bikim. “

**‘Divê helbest bibe çira ronahiya civakê’**

Helbestvan Ferhadê Merdê di dawiya axaftinên xwe de wiha got:”Ez hêvîdarim ku miletê Rojava bi helbest, çîrok û stranên ku ez çêdikim razîbin û di heman demê de armanca min ne ew e ku ez helbesta bêjim da ku bi nav û deng bim. Daxwaza min ewe ku êşa gelê xwe bi riya helbestan derxim. Banga min ji bona rewşenbîr û helbestvanan ew e, ku êşa civaka xwe binivîsînin û xwedî li çand, dîrok û zimanê gelê xwe derbikevin. Ji ber ku bi hezaran Şehîdên me hene û welatê me her tim rastî êrişan tê û axa ma hatiye dagirkirin. Ji ber wê yekê pêwîste ku em pênûsa xwe têxin xizmeta gelê xwe û şev û roj ji bona gelê xwe kar û xebatê bikin. Helbestvan, rewşenbîr, nivîskar û hunermend pêwîste ku bi pênûsa xwe dengvedana şoreşê bighîne cîhanê tevahî û destkeftiyên şoreşê biparêze û bibe çiraya ronahiya civakê. “

# ‘Bêhna nanê tenûrê bi ser bêhna barûdê dikeve’

**Ji ber bombebarana dagirkeriya dewleta tirk binesazî û cihên pêdiviyên sereke zirarên mezin dîtin. Aşxaneya Amûdê jî yek ji wan cihên hat bombekirin e. Ezîza Abid bi çêkirina nanê tenûrê hewl dide çareseriyê bibîne.**

Dewleta Tirk ku di 13’ê Çileyê de êrîşên asîmanî li dijî Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê dabûn destpêkirin, bi dehan cihên binesaziya herêmê bombebaran kir. Di 14’ê Çileyê de jî aşxaneya El-Xeyîrat ku li başûrî navçeya Amûdê ya Kantona Cizîrê di sala 2014’an de hatiye avakirin bombebaran kir. Aşxane pêdiviya ard ji bo beşek Kantona Cizîrê û Dêrazorê re dabîn dikir, her wiha aşxaneya herî mezin a duyemîn li navçeyê ye.
Aşxaneya ku ji ber bombebarana dewleta Tirk 750 milyon Lirayê Sûriyeyê xisar dît, rojane zêdetirî 50 ton arvan derdixist. Hêjayî bibîrxistinê ye ku di êrîşa li ser aşxaneyê de du karkerên wê birîndar bûbûn.
Niha li Amûdê nan qut bûye, ji ber wê jî



jinan zend û bendên xwe badane û destên wan di nav hevîr de ye. Ezîza Abid a 50 salî ji Sinciqa Xelîl a ku li başûrê navçeya Amûdê dikeve dijî, li ser vê mijarê axivî.

**‘Piştî bombebaranê jinan li vir zend û bendên xwe badan’**

Ezîza Abid a ku nanê tenûrê weke nanekî xwedî çêjeke cuda di nav hezkirina rabirdûyê û pêşerojê de pênase kir wiha ji me re behsa vê mijarê kir: “Arvanê ku niha ez jê nan çêdikim, me ji zeviyên xwe yê genimê hilandî ye. Em her sal tedbîrên rewşên wiha yên êrîşan, rêgirî û dorpêçê dikin.” Ezîza bal kişand ser bombebarana li ser aşxaneya Amûdê û wiha tedbîrên girtine bilêv kir: “Niha ji ber bombebarana aşxaneyê arvan û nan qut bûye, ji ber wê min dest bi çêkirina nanê tenûrê kiriye. Şêniyan qûtê xwe yê îsal hilanîbûn û hesabê rojek wekî îro jî dikirin ku wê bi ser wan re were. Bêguman daxwazên cîranên min jî hene, ez tenûrê dadidim û nan ji wan re lêdixim.”

‘Çend sal in em di bin êrîşan de ne’

Ezîza Abid 12 salên şoreşê ku êrîş li ser herêmên wan ranewestiyane bi bîr anî û ev tişt anî ziman: “Çend sal in em di nava êrîşan de ne, gelek rewşên zor bi ser me de hatin ji êrîş, dorpêç û qutbûna arvan, av û hwd. çawa em dikaribûn bi hêza xwe ya cewherî ya hundirîn ew rewş derbas bikin, niha jî em ê ji heqê van êrîşan derdikevin. Hikûmeta Şamê û dewletên din bi destpêkirina Şoreşa Rojava re xwestin me di nava dorpêçê de bixeniqînin.”
Ezîza keda Rêveberiya Xweser a di dabînkirina sotemeniyê ji wan re anî ziman û got ku wan careke din dest bi çandiniyê kirine.

**‘Civat li derdora tenûrê çêdibe’**

Ezîza Abid bi van gotinan dawî li axaftina xwe anî: “Bêhna nanê tenûrê dide ser bêhna barûtê. Civatên jinan ên li dora tenûrê jî dibe sedema dîtina çareseriyan ji pirsgirêkên jinan û malbatî re. Her wiha daxwaza min jî rawestandina şer e, vegera koçberan li warê xwe û em bi hêviya jiyîna rojên xweş in.” **NÛJINHA**

**Têbînî**



## Rexnegiriya Wêjeyî û Rexnegiriya Rexneyê

**Kemal Necim**

Her çiqas kêm û lawaz be jî, lê tevgereke sivik a nirxandin û rexnekirina berhemên wêjeyî li herêmê pêş dikeve, ne bi awayê lêkolînên berfereh lê bi awayên simînarên kurt di der barê hin berhemên wêjeyî yên xwecihî de têne lidarxstin.
Ji wan simaran dawiya hefteya bihûrî yek derbarê nirxandin û rexnekirina berhemeke rexneyî de bû, ango pirtûkeke rexneyî hate nirxandin û rexnekirin, ku ev jî dikeve rêza ``Rexnegiriya Rexneyê`` de.
Rexneya wêjeyî xebata vekolîn, ravekirin û nirxandina berhemên wêjeyî ye. Xebata rexnekirinê jî di çend qonaxan de pêk tê: Dîtin û çavdêrî, vekolîn, şîrovekirin û nirxandin. Di qonaxa pêşî de nivîsa wêjeyî tê xwendin û hewl tê dayîn ku wateya wê were zanîn, di qonaxa duyemîn de jî rexnegir nivîsa wêjeyî analîz dike, hêmanên wê yên bingehîn de ji hev vediqetîne û fêr dibe ku çawa beşan bi hev re girêbide. Di qonaxa sêyem de, rexnegir têkiliya di navbera beş û hêmanan de rave dike û nas dike ku nivîskar çi dixwaze bêje û di dawiyê de jî li gorî têgihiştina xwe ya ji nivîsê bi giştî nêrîna xwe vedibêje.
Ev qonax û rêbaz hemû li gorî hin metod, alav û zanyariyan pêk tên, yên rexnegir jî pêwîst e bê alî li nivîsê binêre. Eger yek ji van hêmanan kêm be, yan alavên ê rexnegir û agahî û zanebûna wî kêm be dê rexneyeke qels û şaş çêbibe. Bi taybet di nava rexnegirên Kurd de dibe ku ev qelsî û şaşî pir derkeve ji ber ku di mijara rexneyê de kesên pispor pir kêm in.
Ji bo ku şaşiyên çalakî û xebata rexneyî nebin rastî û di nava qada wêjeyê de weke rastiyekê belav nebin, pêwîstî bi çalakî û xebata Rexnegiriya Rexneyê heye. Lê ji xwe rexnekirina rexneyên kiryareke lêkolînê ya bi zanebûn û alav û rêbaz e.
Rexnegiriya rexneyê lêkolîneke zanyarî ye ku mijara wê rexneya wêjeyî ye, û rexneya rexneyê li ser lêkolîn û lêkolandina “gotana rexneyî” bi xwe ye, tê wateya lêvegera têgehên rexneyê, avahiya wê ya mentiqî, prensîbên wê yên bingehîn, awayên şirovekirinê, û amûrên pêkanînê ye.
Dibe ku bête gotin ku hîna zû ye qada wêjeya Kurdî têkeve pêvajoya rexnegiriya rexneyê, ji ber ku heta niha qada rexneyê bi xwe hîna lawaz e û bi pergal nebûye. Lê xuyaye û diyar e ku ji ber vê sedemê bi xwe, pêwîstiya wêjeya Kurdî bi rexnegiriya rexneyê heye. Ji ber eger rexne bi xwe lawaz be, hîna neketiba rêya xwe, hîna alavên xwe baş nas nekiribe, dê derbirîn û darazên şaş bike, lewma pêwîst e ku ew berhema rexneyî bi xwe jî têkve ber lêkolîn û nirxandinê.
Di simînara ku me destpêkê behsa wê kiribû de, pir aşkere bû ku gelek boçûn û nêrîn û darazên şaş di wê pirtûka rexneyê de hebûn. Eger ew karê rexnegiriya rexneyê nebûba dibe ku ew boçûn û nêrîn û darazên şaş weke xwe derbasî nava wêjeyê bûbaya.
Rexnegiirya wêjeyî û rexnegiriya rexneyê dê bi hev re pêş bikevin. Pêşketina wan jî dê asoyên nû li pêşiya derbirîna wêjeyî vebike.

# Zarok hêviyên jiyanê ne

Şer û aloziya ku Bakur û Rojhilatê Sûriyê rastî wê tê, bandoreke neyînî li jiyana zarokan dike, lewra Komeleya Stêrk a Şopandin û Parastina Mafê Zarokan hat avakirin. Rêvebera Komeleya Stêrk Cûliya Xelo diyar kir ku ew hewl didin pêşerojeke azad û xweş ji zarokan re bidin avakirin

**Ronaz Silêman/Qamişlo**

Kirîz û şerê ku li giştî Sûriyê û êrîşên ku li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê tê meşandin, bandoreke neyînî li ser jiyana zarokan kir. Herwiha bi armanca bidawîkirina tûndiya li ser zarokan û guhertina rewşa zarokan ya derûnî, di 6`ê Tebaxa 2023'an de, di bin dirûşmeya "Her zarokek stêrkeke", Komeleya Stêrk a Şopandin û Parastina Mafê Zarokan li bajarê Qamişlo hat avakirin. Ev rêxistin bi alîkariya Roja Sor a Kurd ya Siwêdê hat damezrandin. Komeleya Stêrk, Rêxistineke serbixwe ye. Piwîstî bi avakirina wê hebû, da ku şopandin û parastina mafê zarokan li Bakur û Rojhilatê Sûriyê were aktîfkirin, li ser vê bingehê Komeleya Stêrk kar û xebatên xwe dide meşandin.

**Stêrk zarokan fêrî jiyana hevbeş dike**

Li Bakur û Rojhilatê Sûriyê gelek navendên Komeleya Stêrk hene. Beşên wê li Şehba, Heleb, Hesekê, Kampa Waşûkanî (Serê Kaniyê), Navçeya Holê, Kampa Vegerê û Serdem û Herwiha li Amûdê, Qamişlo û Dêrikê jî beşên wê hene. Komeleya Stêrk dozên zarokan dişopîne û hewl dide ku zarokan her dem li jiyan wan ya zarokatî vegerîne. Stêrk zarokên ku rastî tûndî, destdirêjî, ji dibistanê qot bûn, rewşa derûniya zarokan, destwerdanên li ser van rewşan dike. Di heman demê de Komeleya Stêrk bi Komînên taxan re hemahengiyê didin avakirin, di hundirê komînan de jî komînên zarokan ava dikin û perwerde dikin. Di hundirê komînên zarokan de bi rengê komî zarok tên perwerdekirin, da ku zarok fêrî hevbeşî û civakbûnê bibin. Di heman demê de ev komîn li ser çend gavan tên birêvebirin. Mijarên ku zarok fêrî wan dibin, xwe li ser wan perwerde dikin û xwe pêşdixin. Di destpêka avakirina van komîna de hejmara tevlîbûna zarokan kêm bû, lê hin bi hin hejmara wan zêde bûn.

**Pêwîstiyên qonaxên temenê zarokan ji hev cûda ye**

Avakirina komînên zarokan jî li ser van gavan tên avakirin, gava yêkê hemahengî bi komînan re tê kirin, gava 2`an perwerde ji malbatan re tê dayin weke danasîna Rêxistinê, gava 3 yan komên zarokan tên avakirin û nav tên qeydkirin. Her komek girêdayî beşê wan fêrbûna wan tê kirin û beşê mûzîk, dîlan û şano jî tê dayîn. Li kêleka perwerdeyî mûzîk û şanoyê, zarok fêrî çand û exlaqê civakê tên kirin ku çawa zarok nêzî derdora xwe bibin û xwe çawa di rewşên şer de biparêzin. Komeleya Stêrk li kêleka perwerdekirina zarokan, perwerdeyê didin malbatên zarokan jî. Ji ber qonaxên temenên zarokan hene û her qonaxek pêwîstiya wî cudaye. Herwiha Komeleya Stêrk girîngî û baldariyê jî didin zarokên ku rewşa derûnî ya zarokan. Bi vê yekê jî ji dema avakirina Stêrk û heta niha nêzî 10 zarokan tedawiya wan ya derûnî hatiye kirin.



Derbarê kar û xebatên Komeleya Stêrk de Rêvebera Komeleya Stêrk ya şopandin û parastina mafê zarokan li Bakur û Rojhilatê Sûriyê Cûliya Xelo ji rojnameya me re axivî. Cûliya Xelo diyar kir ku Komeleya Stêrk avakirina pêşeroja zaroka ne û wiha got: "Ji bo ku zarok jiyana xwe ya zarokatî jiyan bikin û dûrî rewşên heyî bikevin, em pirojeyan didin avakirin. Niha jî pirojeya mûzîkê li Şehba hatiye destpêkirin, amûrên mûzîkê ji wan re hatine kirîn, da ku fêrî amûrên mûzîkê bibin. Di heman demê de jî koma şanoyê jî hatiye avakirin, ew jî di hundirê piroja Roja Şanoyê ya zarokan de cih digire. Li kampa Serê Kaniyê jî bi hemahengiya Heyva Sor a Kurd re bexçeyekî zarokan hat avakirin. Ji bilî wê pirojeya ku Desteya Şaredariyê pê rabûye ya mala jiyana zarokan a zarokên parsê em cihê xwe di vê pirojeyê de digirin. Zarokên ku rewşa malbatên wan xerab bin û zarok hewcedarî emliyatê bin em bi vê yekê jî radibin û heya niha 2 emeliyên vekirina dil, emliyeke çav û kabokan jî têne çêkirin. Wekî din jî zarokên ku agir bi canê wan ketine em emeliyat dikin."

**'Dibistan avakirina pêşeroja zarokan e'**

Cûliya Xelo di berdewamiya axaftina xwe de anî ziman ku Stêrk dibe alîkara vegera zarokan ji dibistanê re û wiha got: "Malbatên ku rewşa wan xerab bûn û bibû sedema qutbûna zarokên wan ji dibistanê, em bûn alîkarê vegera wan ji dibistanê re, ev yek jî bi hemahengiya Desteya Perwerdeyê tê kirin, ji ber dibistan avakirina pêşeroja zarokan diyardike. Bi vê armancê 40 zarokî/ê me vegerandin dibistanê, 150 çente û lênûs jî belavî zarokên Şehîdan û yên xizan kirin. Pêngava belakirina çakêtan, bi hemahengiya kesekî xêrxwaz re, derdorî 400 çakêt hatin belavkirin, ew jî li Amûdê, Qamişlo, Hesekê û Çil axa hatin belavkirin. Niha jî bi hemahengiya Heyva Sor a Kurd re, me piroja siwarkirina parçeyên laş yên çêkirî ji zarokên ku di şer û erdhejê de dest û lingê xwe ji dest dane daye destpêkirin. Beşê Stêrk yê Şehba bi rengê kom van zarokan rê dikin Qamişlo û li Qamişlo dest û ling ji wan re tên siwarkirin. Ev piroje li ser çend gavan birêve dimeşe, destpêkê bijîşk li rewşa wan guhdar dike, piştî wê pîvanên dest yan ling digire, piştî wê tê amedekirin û siwar kirin, herwiha heftiyekê jî tên perwerdekirin. Li kêleka van gavan em rewşa wan ya biskolojîk jî dişopînin, ji ber dema ku zarokek dest yan lingê xwe ji dest dide, nexweşiyên derûnî jiyan dikin. Ev nêzî 5 meha ye ku ev piroje hatiye destpêkirin û 10 zarok dest û ling ji wan re hatine çêkirin."

**'Her zarokek xwedî hizreke cudaye'**

Cûliya Xelo axaftina xwe wiha qedan: "Kar û xebatên ku em didin meşandin yek alî nikare were meşandin, dibe ku hemahengî were avakirin, li gorî wê na jî dema bixwazin pirojeyekî ji zarokan re bidin avakirin aliyên peywendîdar hene, lewra bi dervere re têkiliyan didin avakirin, li vir jî bi kesên xêrxwaz re, hemahengiyê dikin. Em hewl didin her zarok hizireke xwe bide avakirin, em naxwazin ezezî di navbera zarokan de were avakirin. Jiyana zarokan ji zarokatî ve tê avakirin û xêzkirin. Herwiha bi alîkariya civakê jî me karî mafê zarokan bi cih bînin. Bi hêvîne her kes parastina mafê zarokan biparêze û mîna erkekî li ser mile xwe bibîne."

# Yek ji mûmên azadiyê; Helebce Xelîl

**Navenda Nûçeyan**

**Şehîd Helebce Xelîl tevî ku ducanî bû jî, lê tiştek li pêşiya wê nebû asteng û ji bo xizmeta civakê û bedewkirina bajarê xwe bajar bi bajar digeriya. Dayika wê Mekiya Hiso diyar kir ku Helebçe her dem ji bo pêşxistina civak û derdorê kar û xebat dida meşandin.**

Di destpêka lidarxistina şoreşa Rojava de, yekemîn saziyên ku hatin avakirin Şaredariyên Gel bûn, şaredarî di sala 2013`an de hatin damezrandin, wê demê ji ber ku qirêjiya bajaran zêde bibûn, lewra bi awayekî lezgîn şaredarî mudaxeleyên rewşa bajar kirin, da ku nexweşî di nava gel de dernekevin û bi derfetên xwe yên kêm xizmet ji bû gel didan meşandin. Herwiha di avakirina Şaredariya Gel de jina bi navê Helebçe Xelîl ku ducanî bû, bû qorbaniya encama komkujiya Şaredariyê ya ku di 11`ê Adara 2014`an pêk hat.

**'Tevî ku ducanî bû jî bajar bi bajar digeriya'**

Bi destpêkirina xebatên şaredariyê re Helebce cihê xwe di nava



şaredariya bajarê Qamişlo de girt. Di nava şaredariyê de gelek kar û xebat ji bo xizmeta civaka xwe da meşandin. Helebçe tevî ku ducanî bû bajar bi bajar digeriya û piroje ji bo bajaran dida avakirin. Xebatên Helebçe destpêkê li şaredariya taxa Hilko hat destpêkirin, piştre dema ku Şaredariya giştî ya bajarê Qamişlo li Findeq Hedaya hat avakirin, Helebçe derbasî wê dibe. Û di nava şaredariyê de, di Ofîsa Jin, Darayî û him kar û xebatê giştî yê şaredariyê dikir.

**Jiyan xwe bi hevalên xwe re dadigirt**

Helebce di 12`ê Îlona 1988 ji dayik bûye û keça yekemîn ya malbata xwe bû. Helebçe piştî xwendina xwe ya amadehî bi dawî dike, diçe bajarê Şamê û xwendina xwe ya zanîngehê li wir diqedîne. Li zanîngehê beşa Rêveberiya Karsaziyê derdixe. Helebçe piştî xwendina xwe bidawî dike, dixwaze fêrî zimanê dayikê bibe, lewra bi hewldanên xwe li kêleka zimanê erebî, inglîz fêrî zimanê kurdî jî dibe. Ji ber Helebçe keçeke bi tenê bû, jiyan xwe bi hevalên xwe re dadigirt. Helebçe li kêleka xwendin û pêşketina xwe, pir ji muzîkê jî hez dikir. Herwiha ji bo naskirina kar û xebatên şaredariyê, Helebçe li Bakurê Kurdistanê tevlî 2 perwerdiyan bû.

Derbarê Şahdeta Helebce Xelîl ku yek ji qorbaniyên komkujiya Şaredariya bajarê Qamişlo bû dayika şehîd Helebce Mekiya Hiso ji rojnameya me re axivî.

Mekiya Hiso diyar kir ku wan navê Helebce li komkujiya Helebçe ya ku li Başûrê Kurdistanê pêk hat kir û wiha got: "Dema ku Helebce hat dinayê min dixwesta navê wê bikim hêwa, lê ew komkujiya ku li Helebce pêk hatibû, lewra bavê wê xwest navê wê li komkujiyê bike. Wê demê ez kêfxweş nebûm, ji ber em Kurd her tim tirseke me ji navên komkujiyan heye. Herwiha Helebce ji zarokatiya xwe ve jîr û zane bû, her tişt ayidê xwe qebûl nedikir, dixwest her tim pêşketina ava bike. Bi dilekî pak û paqij bi hevalên xwe re bû, êşa hevalên xwe berî ya xwe dikişand û pir bandorî li wê dikir. Tenê birayek Helebce heye û hizkirina wê ji birayê wê re pir zêde bû.

**'Derdora xwe nîşanî riya pêşketinê dikir'**

Mekiya Hiso anî ziman ku Helebçe riya pêşketinê nîşanî wê dida û wiha got: "Helebce bi temê xwe yê biçûk bîrwer bû û her tim riya pêşketinê nîşanî min dida, di heman demê de bi hemû hevalên xwe re jî alîkar bû. kenê li ser lêvên wê winda nedibû, bi wî kenî derdora xwe jî kêfxweş dikir. Şaştî red dikir, bi taybet digot; me jinan gelek zilm û zordarî dîtiye, êdî bese qebolkirina me jêre. Dema ku Helebçe tevlî perwerdeyên şaredariyan li Bakur bû Osman Baydemir ji Helebça re got; ez bi hêvîme Rojava ava bibe mîna jinên wekî te, ji ber ku Helebçe gavên xwe ji bo pêşketinê davêt."

**'Li pêş cavên cîhanê komkujî tên kirin'**

Dayika Helebce Mekiya Hiso axaftina xwe wiha qedand: "Dema ku Helebçe şehîd bû, ducanî bû. Bûyera şaredariyê



giştî cîhan pê êşiya, ji ber ew kesên ku ji bo xemlandin û xweşkirina bajarê xwe kar dikirin. Jin her tim dixwaze paqijbûna bajarê wê mîna paqijbûna mala wê be, Helebçe jî yek ji wan jinan bû, pir li paqijbûna bajar guhdar bû. Ji xwe çiqas em dengê xwe bikin, cîhan xwe bêndeng dike, ji ber li pêşiya cavê cîhanê komkujî li ser gelê me tê kirin, dijmin dixweze jinê qir bike, ji ber jin aştiyê dixwaze, lewra dijmin dixwaze bi her awayî jinê bike armanc, lê nizane ku her jineke me diçe bi 100` jinên din li ser şopa wê dimeşe."



# Rê û resmên Meha Remezanê

Welatî û firoşkarên bajarê Qamişlo diyar kirin u ji ber buhayê bilind yê kelûpelan her kes di meha Remezanê de zehmetiyan dikşîne û gotin, ji ber têkçûna nirxê lîreya Sûrî û êrişên dewleta Tirk a dagirker piraniya malbatan di milê aborî de zehmetiyên mezin dibînin.

**Hêvî Melek/ Qamişlo**

Li tevahiya cîhanê muslman her sal meha Remezanê bi kefxweşî û coşeke mezin pêşwazî dikin, herwiha di vê mehê de rojiyê digrin. Li gorî ola Îslamê meha Remezanê mehekî pîroz e, ji ber ku di vê mehê de Qur'ana pîroz daketiye. Lê li tevahiya Sûriyê û li herêma bakur û rojhilatê Sûriyê welatî di vê mehê de zehmetiyên mezin dibînin, ew jî ji ber rewşa aborî ya xerabe û buhabûna kelûpelan e.

Di derbarê pêşwazîkirina meha remezanê de û buhayên kelûpelên xwarin û vexwarinê firoşkar û welatiyên bajarê Qamişlo ji rojnameya me re axivîn.

firoşkerê sebzeyan Mustefa Ebdulbaqî diyar kir ku meha Remezana sala par û ya îsal pir ji hev cuda ye û wiha got: "Îsal buhayê sebze û goşt û tevahiya kelûpelan pir bilind bûye. Ji ber wê welatî bi zehmetî rojiya xwe derbas dikin.



Mustefa Ebdulbaqî

Kirîna sebzeyan kêm bûye ew jî ji ber buhayê wê yê bilind e. Rewşa Remezana îsal ji sala borî pir cuda ye ew kêfxweşî û amadekariyên ku berê dihatin kirin îsal ew qas nayê kirin. Ji ber bilindbûna nirxê dolar her tişt buha bûye û bazirgan jî dema ku nirxê dolar bilind dibe ew jî buhayê tiştên xwe zêde dikin lê dema ku dadikeve jî lê nirxê wê bilind dihêlin."

Di heman mijarî de firoşkarê Xurmeyan yê bi navê Mihemed Şepal ku li bazara bajarê Qamişlo kar dike derbarê hazirtiyên meha remezanê wiha got: "Buhayê xurmeyan bi taybet ne bilind e û hemwelatî dikarin bi hêsanî bikirin. Cudahiya di navbera buhayê cureyên sebzeyan û tiştên din de heye mîna buhayê goşt, sebze û şêranî, lê tiştên ku ji meha Remezanê re pêwîstin buha tên firotin. Sala par jî buhayên tiştan bilind bû lê îsal pir zêde ye û gelek kes nikarin pêdiviyên xwe yê jiyanî pêk werînin. Êrişên dewleta tirk jî roleke pir mezin di vê yekê de dilîze, êrişên dewleta tirk jî bandorê li aboriya civakê dike ji ber êrişên wan li ser binesaziya herêmê hemwelatî bê elektrîk û petrol û gelek tiştên din mane, ji ber vê yekê yên ku gelek zirar gihandiye me dewleta Tirk a dagirker e ku hem bi êrişên xwe hem jî bi dorpêçên xwe gel dike armanc."



Hosa Xilêf

Di heman çarçoveyê de welatiya bi navê Hosa Xilêf da zanîn ku ji ber bihabûna nirxên xwarin û vexwarinê hemwelatî pir astengiyan dikşînin û wiha got: "Piştî daketina nirxên lêreya Sûrî li beramberî dolar, Li bajarê Qamislo buhayên kelûpelên xwarinê û sebzeyan gelek zêde bûne. kesên feqîr nikarin rojiya xwe bi awayekî baş biqedînin ji ber vê yekê banga me ewe ku hinek ji nirxên xwarin û vexwarinên remezanê dakeve da ku her kes karibe ji xwe re bikire. Ji ber krîza aboriyê ya li Sûriyeyê û ji ber êrişên li herêmê û hilweşîna lîreya Sûriyeyê dabînkirina pêdiviyên Remezanê zehmet in."



# NY: Êrişên Tirkiyê yên li dijî Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê sûcên şerin

**Komîteya Lêpirsînê ya NY'yê ya taybet bi Sûriyê di raporeke xwe de diyar kir ku êrişên dewleta Tirk a dagirker yên li dijî stasyonên enerjiyê yên Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê dikevin xana sûcên şer û binpêkirina qanûna mirovî ya navnetewî ye.**

Komîteya Lêpirsînê ya NY'yê ya Kar û barên Sûriyê îro raporek da. Komîteyê di raporê de diyar kir ku êrişên dewleta Tirk a dagirker yên li dijî Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê dikevin xana sûcên şer.



Di raporê de hat diyarkirin ku artêşa Tirk a dagirker li dijî deverên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi taybetî stasyonên enerjiyê êriş pêk anîn. Di encamê de mîlyonek welatî ji av û kehrebeyê ji bo çend hefteyan mehrûm man. Ev jî binpêkirina qanûna mirovî ya navnetewî ye. Bi êrişên balafirên bêmirov jî gelek sivîlan jiyana xwe ji dest da. Ev jî sûcên şerin.

Di raporê de paşguhkirina dosyeya zarokên DAIŞ'ê ji aliyê civata navnetewî ve hat behskirin. Endama komîteyê Lynn Welchman di raporê de got: "Cîhan dixwaze vê yekê ji bîr bike. Lê ev 5 sale DAIŞ li Baxoza Sûriyê têk çûye. Hîn jî nêzî 30 hezar zarok di girtîgeh û navendên perwerdekirinê yên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê de girtî ne. Ew zarok di dema kontrola herêmê ji hêla çeteyên DAIŞ'ê de bûn qurbanî."

Lynn Welchman wiha domand: "Em bang li her dewleteke dikin ku rê bidin zarokên xwe, herwiha zarokên Sûriyê yên ku li kampan dimînin ku vegerin welatên xwe û ji bo ji nû ve bi cih kirina wan di nav civakê de tedbîr bên girtin."

Komîte dê rapora xwe di 18'ê Adarê de pêşkêşî Meclisa Mafên Mirovan bike.

# 40 partiyan ruxset wergirtin

**Navenda Nûçeyan**

Li gorî daneyên fermî 40 partiyên siyasî ruxset ji Komîteya Kar û Barên Partiyên Siyasî ya Rêveberiya Xweseriya Demokratîk wergertine.

Li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi dehan tevger û partiyên Kurd, Ereb, Suryan, Asur û Ermenan hene. Hejmara partiyên ku ji aliyê Komîteya Kar û Barên Partiyên Siyasî ya girêdayî Rêveberiya Xweseriya Demokratîk çend in û kijan in?

Komîteya Kar û Barên Partiyên Siyasî ya girêdayî Rêveberiya Xweseriya Demokratîk 7'ê Adarê biryarek derxist. Di biryarê de muhlet heta 1'ê Nîsanê da partiyên siyasî yên li herêmê kar dikin, da ku serî li komîteyê bidin û daxwazanameya ruxsetkirinê bi dest bixin. Herwiha hate diyarkirin ku eger partî neyên ruxsetkirin, dê li dijî wan biryar werin girtin.

Qanûna ruxsetkirina partiyên siyasî ya Rêveberiya Xweseriya Demokratîk di 20'ê Gulana 2018'an hatibû derxistin.

Li gorî daneyên fermî, ji 65 partî û tevgeran, 40 heb hatine ruxsetkirin. Partiyên ruxsetkirî ev in:

Partiya Aştiya Demokratîk a Kurdî, Partiya Lîberal a Kurdistanê, Partiya Demuqrat a Kurd li Sûrî (Partî), Partiya Komunîst a Kurdistanê, Partiya Demokrat a Kurd li Sûriyeyê, Partiya Yekitiya Demokratîk (PYD), Partiya Çep a Demokrat a Kurd li Sûriyê, Partiya Yekitiya Suryan, Partiya Çep a Kurd li Sûriyeyê, Partiya Kombûna Niştimanî ya Kurdistanî, Kongra Star, Partiya Guhertin a Kurdistanê, Partiya Kombûna Demokrat a Sûriyeyê, Partiya Kesk a Demokratîk, Partiya Rêkeftina Demokrat a Kurdî li Sûriyê, Partiya Yekitî, Partiya Biratî ya Kurdistanê (PBK), Partiya Nûjen û Demokratîk, Partiya Nûjen û Demokratîk a Sûriyeyê, Partî Demokratî Kurdistanî, Cebhet Enqaz Sûriye, Partiya Têkoşîna Demokrat, Teyar El Xed El Sûrî (Şepêla Siberojê ya Sûriye), Partiya Roj a Demokratîk li Sûriyê, El Heyeta El Weteniye Litehrîr (Desteya Nîştimanî ya Erebî), Partiya Asûrî ya Demokratîk, Partiya Demokratîk a Muhafezkaran, Yekitiya Kedkaran a Kurdistanê, Heyet El Hensîq El Weteniye- Hereket El Texyîr, Partiya Sûriya Pêşerojê, Şepêla Siberojê ya Kurdistanê, Partiya Demokratîk a Sûriyeyê, Partiya Muhafezkaran a Kurdistanê, Şepêla Sûrî ya Çaksaziyê, Partiya Demokrat a Kurdistanê-Rojavayê Kurdistanê, Partiya Pêşxistin û Guhertina Nîştimanî ya Demokratîk, Partiya Avakar û Pêşxistin a Sûriyeyê, Şepêla Çep a Şoreşger li Sûriyê, Partiya Guhertin û Ronesans a Sûriyeyê, Hevbendiya Niştimanî ya Sûriyeyê.

Beriya demekê Rêveberiya Xweseriya Demokratîk ruxset ji Partiya Yekitiya Nîştimanî ya Azad a Rojava û Partiya Komarî ya Kurdistanê standin.

Rêveberiya Xweseriya Demokratîk di beşa duyemîn a Hevpeymana Civakî de ku 12'ê Kanûna 2023'yan hatibû erêkirin, mafên azadiya derbirîna siyasî misoger dike.


# Riya IMEC'yê ya abûriyê ya hêzên kaptalîzimê, rêya qirkirna gelan e

Hêzên Kaptalîzim ji bo pêkanîna serweriya xwe li Rojhilata Navîn, di nava piroje û planên serweriya aborî de bênavber berdewam in. Yek ji girîngtirîn projeyên aborî yên hêzên kaptalîzim, riya IMEC ya aborî ye. Lê ji ber ku ev riya aborî ku ji Hindê ber bi Ewropayê ve diçe, ne li gor berjewndiyên Tirkiyê û Îranê bû, wan ji bo tevlihevkirina kaxezan Hemas bikar anîn.

**Reşo Mihemed/ Qamişlo**

Di Îlona sala 2023'an de, ji bo lidarxistina hevpeymaneke abûrî li ser asta cîhanî, Amerîka, Hind, Feransa, Almaniya, Îtaliya, Yekîtiya Dewletên Ewripayê, Siûdiyê û Îmarat reşnivîsek dan îmzekirin. Ev reşnivîs ji bo destpêkirina pirojeya aborî ya bi navê IMEC ango Xeta Hind-Rojhilata Navîn-Ewropa ya Aborî, îmzekirin.

Xeta aborî yek ji xetên herî mezin di cîhanê de ye ku parzemîna Asiya, Rojhilata Navîn bi Ewropayê ve girêdide. Herwiha ev xeta aborî ji Hindê destpê dike, derbasî Kendava Erebî dibe, ber bi Israyîl ve diçe û ji wir ber bi parzemîna Ewropayê dibe.




### Pilanên hêzên sermayedar ji bo rêvebirina abûriya xwe û rikberiya wan

Her tevgereke aborî ya ku li ser ruyê cîhanê, di navbera hêzên kaptalîzima nûjen de pêk were, helbet li pişt wê berjewendiyên ku dikevin xizmeta dewletên desthilatdar hene. Ev hêzên sermeyadara cîhanî ya nûjen yên ku dixwazin bibinesaziya herêmên zengîn bixin bin serweriya xwe ya leşkerî. Li Rojhilata Navîn û cîhanê di warê abûrî û dijberiya siyasî de Amerîka, Çîn, dagirkeriya Tirk, Îran di asta yekê de rikberiaya hev dikin. Di destpêka sala 2011'an de li gelek welatên ereban şer û pevçûn di navbera hikumetên erebî û komên cuda bi awayekî tund rûda. Weke Îraq, Sûriyê û Yemen û hêzên navdewletî weke Hevpeymana Navdewletî, dagirkeriya Tirk, Îran û hwd destwerdana leşkerî kirin û her yek ji wan bûn hevalbendê aliyekî. Herêma Rojhilata Navîn ji bo wan hêzan jî bû navenda şer û nakokiyan di heman demê de lihevkirina li ser bazirganiyê. Di 2013'an de jî dewleta Çînê insiyatîfa ji bo destpêkirina pirojeya riya abûrî ya bi navê bi Riya Herîr a nû da ragihandin. Dewleta Çînê bi riya xeta aborî û insiyatîfa xwe xwest vejînekê bide riya Herîr a ku weke kevntirîn riya bazirganiyê tê naskirin. Lê ji ber şer û pevçûnên li Rojhilata Navîn rûdidan derfet bi Çînê re çênedibû ku dest bi pirojeya xwe bike. Di adara 2023'an de derfet bi Çînê re çêbû ku nakokiyên di navbera Siûdiyê û Îran yên heyî ji holê hilîne û armancên xwe yê girêdayî pirojeya riya Herîr hin bi hin pêk bîne. Di heman demê de dewleta Tirk a dagirker û Îraq jî di Pûşbera sala 2023'an de dest bi hevdîtinê ji bo vekirina riyeke abûrî ku wê ji Kendava Erebî ber bi Tirkiyê û Ewripayê ve biçe, kririn. Dagirkeriya Tirk ji bo pêkanîna berjewendiyên abûrî û hewldana dagirkirina xaka Başûrê kurdistan û Îraqê gelekî bilez û dozdar e. Lewma jî pirojeya abûriyê ya herî mezin ku bi navê IMEC'ê weke riyeke rikber ji riya Herîr û ya Îraq-Tirkiye hat destpêkirin.

### Çima niha projeya IMEC'ê kete rojeva cîhanê?!

Di Îlona sala bûrî de bû ku reşnivîsa pirojeya IMEC'ê hate îmzekirin û Amerîka ya ku weke serwera bazirganiya serdemî tê naskirin, yek ji dewletên îmzekarên wê bû. Heta ku ev xeta ekonomî pêk were, demeke dirêj û bi milyarên dolaran jê re pêwîste. Ji ber ku ev xeta bazirganiyê bi riya deriyayan û bejayiyê wê were vekirin. Herwiha wê 20 dewletên cuda ji bazirganiya ku were kirin di warê abûrî de qezenciyeke mezin bikin. Dewleta Amerîka xwe weke qezenckara abûrî ji vê pirojeyê nabîne, lê dibêje ez ê serpirştiya wê û piştgiriya wê bikim. Gelo rikberiya bazirganiyê ya di navbera Amerîka û Çînê de, herwiha hewldana herdu dewletên mêtinger yên ku dixwazin herêmê bixin bin serweriya xwe de, dest nîşan nake ku Amerîka wê ji vê riyê qezenc bike?! Bi riya Insiyatîfa Kember û Riya Çînî ango riya Herîr a nû ya abûriyê, Çîn dixwaze welatên ku abûriya wan li paş e, pêşxistina aborî û vejandin pêk bîne. Lê weke tê xuyakirin dewleta Çînê dixwaze bi riya van têkiliyên bazirganiyê cihê serweriya xwe di herêmê de ava bike û hin dewletan bixe bin serweriya xwe. Weke ku tê texmînkirin riya Hind-Rojhilata Navîn- Ewripa ya ku bû rojeveke cîhanî û herêmî dê rê li ber pilanê Çînê yên aborî bigire. Bisporê parzemîna Asyaya Başûr yê Navenda Wilson ya Washingtonê, Michael Kugilman ev yek bi postekê li ser Twiterê da tekezirin û wiha got: "Eger ev yek pêk were, ew ê bibe porjeyeke serkeftî û têkiliyên di navbera Hindê û Rojhilata Navîn de bihêztir bibin. Di heman demê de wê bibe rikbera Insîyatîfa Çînê ya ku doza destpêkirina riya Herîrê ya nû dike. "

### Gelên Sûriyê, Israyîl û



### Filestînê dibin qurbana berjewndiyên sermayedaran

Dema ku nîqaş li ser xeta IMEC'ê û îmzekirina reşnivîsa destpêkirna pirojeya riya bazirganiyê hat kirin û hat dîtin ku ne dagirkeriya Tirk û ne Îran sûd ji vê riyê nakin, êdî mîna hirçekî berçî ku di xewa giran de ma ye û derng şiyar bûbe li Tirkiye û Îranê hat. Bi lez û bez dewleta Tirk û Îranê tevî nakokiyên di navbera xwe de, li hev rûniştin û xwestin bibin kelemek li pêşiya riya IMEC'ê.Weke em dizanin xeta abûriya nû di Israyîlê re ber bi Ewripayê ve derbas dibe û çêkirina aloziyeke domdar dibe pilaneke serkeftî ji bo veguherandina berê vê riyê ber bi Îraq û Tirkiyê ve. Ev yek bi riya çêkirina aloziyekê li Israyîl û Filestînê tê pêkanîn. Êrişa ku di 7 Cotmeha 2023'an de ji aliyê Hemasê li ser Israyîlê pêk hat, bi piştevaniya Îran û dagirkeriya Tirk bû. Di encamê de gelek welatiyên israyîlî ji ber vê êrişê jiyana xwe ji dest dan û hatin revandin. Israyîl jî weke berteke tund li hemberî Hemas û gelê Filestîn da nîşandan. Îran û dewleta Tirk a faşist rola temaşevaniyê û barîna hêsrên sexte li ser gelê Filestînê lîstin. Dema ku Erdogan li ser gelê Filestînê dibariyan, di haman demê de êrişî gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê dikir. Li hevkirina Îran û dagirkeriya Tirk li ser mijara ku tevlîheviya li pêşiya riya IMEC'ê pilanek bû û li ser hisabê xwîna gelên Filestîn û Israyîlê bû. Herwiha me dît ku çawa Erdogan berjewnidiyên xwe yên abûrî di bin maska sexte ya olî de veşart û xwe weke xelîfeya ola Islamê da nîşandan. Erdogan mijara gelê Filestîn ji bo berjewendiyên xwe bazirganiyê kir rojeveke cîhanî. Di heman demê de jî Amerîka ku weke hevalbenda Israyîl e û xeta abûriya nû di erda Israyîl re derbas dibe piştgiriya Israyîl kir û bi lez çekên herî pêşketî ji bo kuştin û koçkirina gelê Filestînê şand. Li aliyê din jî dagirkeriya Tirk êrişên xwe li ser gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi awayekî herî tund didomîne. Dagirkeriya Tirk rasterast sîstema aboriya civakî ya ku li Bakur û Rojhilatê Sûryê tê kirin, hedef digre. lê Hêzên Hevpeymana Navdewletî, Amerîka û cîhan bi giştî ji vê yekê bê deng in. Di dawiyê de tê xuyakirin ku hêzên kapîtalîst tevî ku dizanin bi destxistina abûriyeke baş ji bo xwe li ser hisabê xwîna gelan be, lê dîsa jî hedefa wan ew yek e.



## 20 sal in hişmendiya dewletê ya 12'ê Adarê hîn berdewam e

**Dilyar Cizîrî**

Piştî têkçûna rêjîma Baas a Iraqê di sala 2003'an de pêk hat, destkeftiyên gelê kurd li Başûrê Kurdistanê bi ragihandina Iraqa Federal a ne navendî tacîdar bû. Kurdên ku di sala 1991'an da herêmên xwe rizgar kiribûn, statuya xwe di zagonan de fermî kirin. Guhertina li Iraqê û destkeftiyên kurdan li wê derê hikûmeta Baasê ya li Sûriyê jî xist bin tirs û fikaran de. Wan jî wiha hesab kir, desthiladariya wan ketiye xeteriyê. Bi taybet wê demê demek ne dirêj bû Serokê Sûriyê yê Niha Beşar El-Esed hatibû şûna bavê xwe û serokatî bi fen û fûtan wergirtibû.
Di wê atmosfera rêjîma Baas a Sûriyê tê de bû di 12'ê Adara sala 2004'an de alîgirên Partiya Baas bi awayekî plankirî şandin Qamişlo da ku gelê kurd di nav mala wan de çavşikandî bikin. Wan maça fotbolê ya di navbera Tîma Cîhad a Qamişlo û Tîma Fitnê ya Dêrazorê wekî firsed dîtin. Bi hezaran alîgirên rêjîma Baas ji Dêrazor û deverên din bi koç û keviran derbasî stasyona Qamişlo bûn. Beriya Marş destpê bike, dest bi diruşmeyên nijatperestî yên dijberiya gelê kurd dikin, beriz kirin.
Di wê rojê de zarok jî di nav de hejmarek şehîdên Qamişlo çêbûn. Şêniyên Qamişlo bi hewara zarokên xwe yên di stasyonê de asê mabûn çûn, stasyon û herêma derdora wê dorpêç kirin. Hêzên rêjîmê bi hêza artêşa rê vekirin û çeteyên anîbûn stasyonê bi darê zorê derxistin.
Di wê navberê de dema li Qamişlo gel serî hildabû li bajarên din ên Rojava gelê kurd li dijî sîstema hişk a dewletê serhildanên girseyî lidar xistin. Ji tevahî bajar û gundên Rojava wêdetir jî li Heleb û Şamê gelê kurd li dijî sîstema zalim serî hilda û pergala tirsê şikand. Xwepêşandan bi rojan dewam kir.
Hikûmeta faşist wê demê li hin bajarên Rojava çeteyên xwe di bin navê eşîrên ereban de erkdar kirin, dest bi dizî û talana malên kurdan kirin. Rêjîmê wiha xwest nîşan bide, gelên herêmê li hev ketine û xwe ji berpirsyariyê dûr bixe.
Balkêş bû, gelek eşîr, rûsipî û malbatên erebên herêmê yên bîrwer derketin, malên kurdan parastin û rê nedan destdirêjî hîn zêdetir bibe. Bîrweriya wan û a gelê kurd ne hişt hewldanên tevliheviyê kûrtir bibe.
Hikûmeta Baas piştî serhildanê bi hezaran ciwanên kurd girtin û êşkence kirin. Hin ji wan di bin êşkenceyê di girtîgehan de şehîd bûn. Hin jiwan jî şûna êşkenceyan di laşê wan de maye.
Bi 12'ê Adarê zemîna bingehîn a şoreşa gel a 19'ê Tîrmehê ya sala 2012'an destpê kir. Lê vê carê gelê kurd hîn zêde bibû xwedî tecrube. Gelê kurd ji aloziya Sûriyê giştî re pêşengtî kir. Dewleta Tirk û çeteyên wê ji Serêkaniyê êriş pêk anîn û xwestin tevliheviyê di navbera pêkhateyan de derbixin. Ew hewldan serneket. Heta niha jî hewldanên hişmendiya dewleta Tirk berdewam dike.
Hikûmeta Şamê jî herî dawî li Dêrazorê xwest di bin navê eşîran tevliheviyê derbixin. Ew hewldana wan jî serneket. Niha jî Hikûmeta Şamê, Dewleta Tirk, Îran û Rûsiya jî dixwazin wê tevliheviyê bighînin encamê.



# Serhildana Qamişlo hîmê şoreşê ava kir

Di 12'ê Adara 2004'an de û rojên piştî wê, bajarên Rojava bûn şahidê serhildaneke girseyî ya gel li dijî rejîma Baas, piştî komkujî û bûyerên bi êş ên ku li stadyuma bajarê Qamişlo dema leystika gokê di navbera tîma El-Cîhad û El-Fitiwa de qewimîn û bû sersebebê ku gel li seranserî Rojava li hemberî rejîma Baas bi serhildaneke girseyî rabe ser piyan.

**Deriya Çiya/ Qamişlo**

Meha Adarê ji bo kurdan meheke dîrokî ye, ji ber ku di meha Adarê de hem pîrozbahî, rojên kêfxweşî û dilşadiyê hene û hem jî rojên berxwedan, tekoşîn jî û li milekî din jî kumkojî û bûyerên bi êş jî di nava xwe de digire. Lê herçiqasî meheke bi êş û azare jî, lê ji milekî din ve jî mîna meha berxwedan û têkoşîna gelan jî tê naskirin. 12'ê Adara 2004'an salvegera komkujiya ku bi destê rejîma Baas li ser gelê Kurd hatiye rêxistin û pêkanîn e. Rejîma Baas a desthilat rastiya xwe û planên xwe yên esasî li ser tune hesibandina nasnameya Kurdî ava kir û heyanî îro jî hîna jî vê rastiya xwe diparêze û xwediyê vê hişmendiyê ye. Yek ji van pilanên wê yên qirêj û gemar jî avakirina dijminatiyê di navbera gel û netewan de û hedefgirtina destkeftiyên herêmê ye .



### Bûyera 12'ê Adarê

Di 12'ê Adara sala 2004'an de, demjimêr 11:30 li bajarê Qamişloyê di navbera tîma Cîhad a Qamişlo û tîma Fitiwê ya Dêrazorê de maça futbolê hat lîstin. Lê dema lîstikvan û gel derbasî stadyumê bûn, komên nijadperest ku ji berê de ji aliyê rejîma Baas ve hatibûn erkdarkirin, axaftin li dijî gelê kurd û rêberên wan dikirin û digotin bijî Sedam Hisên'. Li gel dirûşman jî bi keviran êrîşî kurdan kirin. Polîs û leşkerên rejîmê hemwext vê yekê êrîş pêk anîn û hemû deriyên stadyumê girtin. Endamên rêjîma Sûriyeyê dest bi êrîşa li ser welatiyên Qamişloyê kirin.
Dema alîgirên tîma Fitiwê û Cîhad bi hev ketin, hêzên rêjîmê bi fermana parêzgerê Hesekê yê wê demê Selîm Kebûl, yekser destwedan kirin û bê ser û ber gule li gelê Kurd û girûpa Cîhadê reşandin. Ev yek di dîmenên ku dezgehên çapemeniyê di wê demê de belav kiribûn diyar bû. Di encamê de 9 kesan ku di nav de 2 zarok jî hebûn jiyana xwe ji dest dan. Piştî ku agahî belav bû, bi sedan ciwanên kurd berê xwe dan stadiyomê, tevî ku hêzên rêjîmê nehiştin derbasî stadê bibin, ji ser dîwaran re derbas bûn û piştgirî dan birayê xwe yên di nav stadyomê de û bi vî awayî pevçûn rû da. Berpirsê parêzgeha Hesekê yê wê demê Selîm Kebûl, ferman da ku gule li kurdan bireşînin, ji ber vê yekê hejmareke mezin ji welatiyên kurd şehîd û birîndar bûn.

### Roja dûyem ji serhiladanê

Di roja duwem ji serhildanê angu roja 13'ê Adara 2004'an de, zêdetirî 200 hezar Kurd daketin kolanên Qamîşlo û merasîma oxirkirina cenazeyên çar şehîdên ku di roja yekem ji serhildanê de şehîd bûbûn lidarxistin. Dubare hêzên asayîşa rejîma Baas destwerdana merasîmê kirin û daxwaz kirin ku alên Kurdistanê ji ser cenazeyên şehîdên komkujiyê bêne rakirin. Di nava hêrs û berteka gel a ku gihişte asta herî jorê, xwepêşanderan bersiv dan û dest bi bilindkirina diruşme û daxwazan kirin. Hêzên asayîşê careke din gule li hewayê reşandin, piştî wê jî raste rast gule li welatiyan hate rewşandin û di encamê de gelek welatî şehîd û birîndar bûn. Gel li hemberî rewşa heyî xwe negirt û mîna lehiyê dakete kolanan û li seranserî Rojava xwepêşandanên girseyî destpêkirin. Gelê Kurd li seranserî Rojava, di serî de li bajarê Qamişlo, Dirkê, Amûdê, Hesekê, Kobanê, Efrînê û taxên Kurdan ên Reqa û Helebê rabûn ser piyan û di 13'ê Adarê de yekem car serhildana gelê Kurd dest pê kir. Li paytexta Sûriyê Şamê û li hemberî serhildanê hêzên çekdar ên rêjîma Bass bi çekên giran êrîşî gelê Kurd kirin. Hêrsa gelê kurd bilind bû û peykerên serokê wê demê yê Sûriyê Hafiz El-Esed li Dirbêsiyê û Amûdê hilweşandin û li Kobanî jî navendên hikûmetê dorpêç kirin.

### Ermanca rejîma Baas ji vê pilanê

Endamên rejîma desthilat bi vê pilanê xwestin ku li Cizîrê fitnê di navbera pêkhateyên herêmê de derxe. Rejîmê bi rêya hin çeteyên xwe dema maça di navbera tîma Fitiwê ya ji Dêrazorê û tîma Cîhand a ji Qamişlo de ev fitne çêkir û li hemberî welatiyan çek bi kar anîn û êrişî welatiyên kurd kirin. Yek ji armancên sereke yên vê planê ew e bû ku nakokiyên di nava sistema desthilat bi xwe de derxînin derve û hewldanên çaksazkirinê ku di esas de nehatin kirin, bi dawî bikin. Di heman demê de armanc ji vê planê ew bû ku hemû deriyan li pêşberî guhartina ber bi demokrasiyê ve bigrin û riyên çareseriyê li Sûriyê û herêmê bixetimînin. Lê tevî vê yekê jî rejîma navendî ya desthilat bi awayekî tund nêzî daxwazên gel yên aştiyane bû û di encamê de bi dehan şehîd û birîndar çêbûn.

### Şehîd her sal tên bibîranîn

Kumkujiya li Qamişlo rûdayî û piştî wê jî serhildana gelê Kurd li seranserî Rojava bû bingeha şoreşa 19'ê Tîrmehê. Herwiha bi reman û felsefeya Rêber Apo gelê Kurd di serî de li Rojava û bi hişmendiya Netewa Demukratîk û biratiya gelan û sîstema konfedralîzma demukratîk rêveberiya xwe ya xweser ava kir û heyanî astekî hemû pilanên hêzên serdest valederxistin.
Gelê Kurd û hemû pêkhateyên li Bakurd û Rojavayê Sûriyê bi hevgirtina xwe rê li pêşiya planên gemar û qirêj ên rejîma Baas û hêzên desthilat girtin û navê stadyuma ku rejîma Sûriyê lê komkujî pêk anî kirin "Stadyuma Şehîdên 12'ê Adarê". Herwiha di ji bona bîranîna şehîdên 12'ê Adarê û di stadyumê de her sal di navbera tîmên Qamişlo û yên Dêrezorê de maçeke biratî tê lîstin
Herwiha ji sala 2005'an ve û ji bona bîranîna şehîdên komkujî û serhildana Qamişlo, gelê Rojava her sal êvara 11'ê Adarê mûman vêdixin û her sal di saet 11:00'an de ji bo rêzgirtina şehîdên serhildana 12'ê Adarê bi xoleyekî rêzgirtinê têne bibîranîn.

## Plana Aloziyê Dixebite



**Zekî Bedran**

Dewleta Tirk a dagirker ji bo êrişa li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê amedekariyên didomîne. Biryarên xwe li ser ragihandinê jî tînin ziman, raya giştî ya derve û hindir ji vê re amede dikin. Herî dawî Erdogan got, "Emê bibin kabûsa yên dixwazin terorîstanê ava bikin". Tirkiyê beriya niha jî hinek herêm dagir kir. Cihê ku dagir kiriye weke axa xwe bikar tînin. Dema mercan ava bike dê dagir bike. Ev berê li cihên weke Hatayê pêk anî. Niha tunekirina nîjandî jî li vê zêde kiriye. Dixwaze herêmê ji Kurdan paqij bike.
Erdogan bi hikumeta Sûriyê re hevdîtin pêk anîn û dixwest ji bo hilweşandina rêveberiya xweser lihev bikin. Lê Beşar Esad ev nepejirand. Dema dagirkerî didome, Tirkiye derketina ji Sûriyê goftogo nake û demekî ji bo vê diyar nake, hevdîtina Esad dagirkeriyê rewa dike. Rûsyayê ji bo van hevdîtinan hewl da û hîn jî hewl dide.
Her çendî hevdîtin weke xwesteka Erdogan çênebûn jî, bi hewldan û kordîneya Rûsyayê hevdîtinên di navbera Tirkiye, rêveberiya Şamê û Îranê de didomin. Li hemberî Rêveberiya Xweser navendên operasyonên hevbeş hatine avakirin. Weke tê fêmkirin parvekirinên istixbaratî jî zêde bûne.
Sedemê vê hevkariyê ewe ku plana aloziyê ya Erdogan jê re dibêje "kabûs" xistine dewrê. Rêveberiya Sûriyê di rewşa niha de nikare bi awayê leşkerî êrişî rêveberiya xweser bike. Rewşa wê ya aborî pir xirab e. Nikare leşkerên xwe jî biparêz e. DAIŞ û komên din êriş dikin û kom bi kom leşkerên wan dixin. Dewleta Tirk jî leşkerên Sûriyê dike armanc. Rêveberiya Şamê heta niha ne bersivek dayê ne jî hewldanek cidî kiriye.
Li şûna vê êrişên dewleta Tirk ji xwe re dike derfet û dixwaze bibe hevkarê plana tunekirina rêveberiya xweser. Li şûna ku bi rêveberiya xweser re bicive û li hev bike, lihevkirina bi Erdoganê faşîst re hildibijêre.
Îran jî bi awayek aktîf di vê planê de cih digre. Dê dewleta Tirk êrişî cihên weke Minbicê bike û artêşa Sûriyê jî bikeve bajêr. Bi vî awayî dê QSD bimîne di navbera du agiran de. Dê hinek aliyên Ereb jî bixin tevgerê û QSD neçar be ji Minbicê derbikeve. Dê tevlîheviyên hemşêwe li Dêrazor û Reqayê jî derbixin. Heman demê de ji bo ewlehiya li Qamişlo, Hesekê jî di nav de tevahî Bakur û Rojhilatê Sûriyê têk bibin dê bi giranî kar bikin. Dê Rûsya van tevlîhevî û êrişan kordîne bike.
Tirkiye bi çeteyên destê xwe û hêza xwe nikare encama dixwaze bidest bixe. Li hinek herêman her çendî zorê bide jî dê şer dirêj bike û berteka gel çêbibe. Di dagirkirina Serêkaniyê de ev yek bi gotina "Em di cîhanê de tenê mabûn, kesî alîkarî neda me" îtiraf kiribû. Li gel piştgiriya PDK, DYE û NATO'yê û erêkirina wan li Başûrê Kurdistanê encama ku dixwest bidest nexist. Niha ji bo PDK'ê bixe şer û hikumeta Iraqê jî bike hevkar hertim hevdîtinan çêdike.
Li Sûriyê jî dewleta Tirk ji bo tunekirina rêveberiya xweser hewl da bi Îran, Sûriye û Rûsyayê re li hev bike. Weke tê dîtin hinek tişt bidest xistiye. Li gel nakokiyên di navbera van hêzan de jî ji bo tunekirina Kurdan û tunekirina avabûna demokrasiyê bûne hevkar. Balkêş e, dewleta Tirk a dixwest Esad hilweşîne û welatê wî dagir bike, niha Esad bi dewleta Tirk re li dijî Kurd û demokrasiyê bûye yek!
Rûsya, ji bo DYE yê ji Sûriyê derbixe dixebite. Eger DYE derbikeve dê Rûsya petrola Sûriyê bikar bîne. Di vê mijarê de bi hikumeta Şamê re lihev kirine. Jixwe Îran her çendî bi DYE yê re ne di nava şerekî fermî de be jî, hertim di navbera wan de şer heye. Hikumeta Şamê jî ji bo xwe ji vebijêrkek demoratîk û daxwaza rêveberiya xweser xilas bike li atmosfer û derfetek wiha digere. Heman demê de dê hewl bide herêmên di aliyê petrol û çandiniyê de dewlemendin bixe destê xwe û rewşa xwe ya aborî sererast bike. Dewleta Tirk jî ji bo ji Kurdan xilas bibe dê destkeftiyên bi berdêlên pir mezin hatine qezenckirin ji holê rake. Dê di navbera xwe de lîstoka qezençkirinê bilîzin. Dê armanca wan a hevbeş ew be ku bi Kurdan û gelên demokrasiyê dixwazin bidin windakirin!
Em diyar bikin ku PDK jî beşdarî vê hevkariyê bûye. Qet nebe pêwîste raya giştî ya Kurd vê bizane. Çawa ku PDK dagirkerî û êrişên dewleta Tirk ên li Başûrê Kurdistanê rewşa dike û di cîhanê de ji bo Erdogan xebatên dîplomatîk dide meşandin, li Rojava jî heman karî ENKS dike. ENKS jî êriş û dagirkeriya Tirk bi PKK û YPG re radigihîne. Yanî, Tirkiye ji bo komkujiyên xwe mafdar derxe û doza Kurd terorîze bike dixe çarçoveya têkoşîna li dijî teror û PKK'ê. ENKS jî avê dixe aşê Tirkiyê. Dibêje, "Eger PKK û PYD nebûya Tirkiyê êrişî Rojava nedikir" û bi vî awayî ji derve û hindir re propogandayan dike. Dîplomasiya Erdogan dimeşînin. ENKS'ê nekarî bi rewşa xwe ya heyî bibe hêzek a Rojava. Di destê PDK'ê de bûye amûrek erzan. Eger xwedî li Rojava derbiketiba û biba xwedî vîn, li hemberî komkujiyên li ser gel nedibû temaşevan. Hinek rêveberên wan ên ji derve dema dewleta Tirk fermandarên QSD'ê qetil dike keyfxweş dibin. Nayê bawerkirin lê rastî ev e. ENKS ya ku li PDK'ê dinêre û dibe sîbera wê êdî fêm bikin!



## Rihê Serhildana Qamişlo

**Farûk Sakik**

Ji 20'ê Adara 2003'yan heta 1'ê gulana 2003'yan ji aliyê Amerîkayê û hevalbendên wê ve li dijî Iraqê şerek dest pê kir. Piştî şer û dema ku rejîma Sedam Huseyîn bi dawî bû, kaoseke mezin li Rojhilata Navîn dest pê kir.
Roj hat me dît ev kaos derbasî herêmên Kurdistan jî bûne. Dagirkerên Kurdistanê, li dijî êrişên welatê wan pêk dihatin, bêdeng diman û di dijminatiya xwe ya li hemberî Kurdan de israr dikirin.
Di 12'ê Adara 2004'an de li Qamişlo dema ku tîma Fetwa ya ji Dêrazorê û tîma Cîhad a ji Qamişlo dest bi maça futbolê kirin, li dijî Kurdan êrişan dest pê kir. Polîs û leşkerên rejîma Baas jî li şûna pêşî li êrişan bigirin, yekser êrişî xelkê Qamişlo kirin. Di encama guleреşandinê de 2 jê zarok 9 sivîl qetil kirin.
Piştî demek li seranserê Rojavayê Kurdistan serhildanan dest pê kir. Bi taybetî di merasiman de gel li şehîdên xwe xwedî derdiket û tevlî merasiman dibûn. Rejîmê dest bi êrişan kir û 36 kes şehîd bûn.
Ev rihê li Qamişlo dest pê kir di gelek demên stratejîk de ji têkoşîna Kurdan re pêşengtî kir.
Çirûska Şoreşa Rojava jî ji Qamişlo dest pê kiribû. Herkes behsa sala 2011'an bike jî lê bingeha vê şoreşê dema ku ev komkujî veguhêrî serhildanê. Di sala 2011'an de dema şerê Sûrî dest pê kir, kurdên Rojava bi rihê Qamişlo, xeta sêyemîn tercîh kirin. Îlankirina rêveberiyên xweser li kantonên Efrîn, Kobanê û Cizîrê di sala 2014'an de ji bo gelê Kurd û gelên herêmê gaveke dîrokî bû. Her ku şer li tevahiya Sûriyê dewam dikir, gelên Rojava bi rihê Qamişlo, xwe bi rêxistin kirin û rêveberiya xwe îlan kirin. Bi îlankirina kantonan re êrişan jî dest pê kir. Di destpêkê de El Nusra û piştî demek jî çeteyên DAIŞ'ê êrişî van kantonan kirin.
Heger piştî komkujî û serhildana 12'ê Adarê pêdiviyek bi ewlekariyê nedîtina û YPG-YPJ'ê nehatina avakirin wê Kobanê rizgar bibûya? Na…
Îro tehdîd û metirsiya li ser Rojava bê sekin dewam dike. Di serî de dewleta Tirk a dagirker û hin hêzên hegemon dixwazin sîstema bi paradîgmaya Rêber Apo hatî avakirin ji holê rakin. Dixwestin wek Efrîn, Serêkaniyê û Girê Spî hin deverên din jî dagir bikin. Heger rêveberiya xweser bi rihê Qamişlo, di warê dîplomasiyê de, ewlekariyê û aborî de hin tedbîr negirtina me yê nikariba pêşî li êrişên Tirkiyê yên dagirkeriyê bigirin. Ew rihê berxwedana 12'ê Adarê îro li asîmanên Rojava belav bûye. Dewleta Tirk bênavber û bêsînor êrişî sîstema xweseriya demokratîk dike. Lê hay wan jê tune ku ew sîstem bingehek xwe ya dîrokî heye. Bi tang û topan ev sîstem nayê ruxandin.
Berevajiyê rûxandinê, dema ku li jor balafirên dewleta Tirk bombebaran dikirin, li jêr rêveberên xweseriya demokratîk 'hevpeymana civakî' îmze dikir. Dema dewleta Tirk a dagirker, binesaziyên heremê serûbin dikir, rêveberiya xweser jî li aliyek xebatên, ji nû de avakirina binesaziyan dimeşand. Dema ku dewleta Tirkiyê ji bo êrişên xwe, li hin hevalbendan digeriya, Amerîka, Rûsya û Îranê re dest bi danûstandina kir, rêvebriya xweser li Ewrupa di nav xebatên dîplomasiyê de bûn.
Dema ku hêzên koalisyonê li hember DAIŞ'ê bêdeng bûn, QSD'ê dest bi operasyonê li dijî DAIŞ'ê kiribû. Dema ku li herêmên hatine dagirkirin, sûcên li dijî mirovahiyê pêk dihatin, hêzên YPJ û YPG ji nû de bi rêxistin dibûn. Hêzên rizgarkirina Efrînê operasyon li ser hev li dar dixistin.
Ev rih, rihê serhildana Qamişlo ye. Tu hêzek nikare li hember vî rihî encamê bigire.